# welat

Sal:2 Hejmar:104 13–19 Reşemî 1994 10.000TL (KDVD)    Rojnameya Hefteyî


*Çavekî wî mabû ew jî teqandin*

## Hevalê şevê mamosteyê jiyanê

Rûpel 11




*Di meha dawî de bi zêdebûna êrîş û cinayetên kontra û cerdevanan, hilweşandina gund û tehdîtkirina berendamên welatparêz re li Kurdistanê jiyan dijwartir dibe.*

# Şertên hilbijartinê ji holê radibin

- Li Kurdistanê encamên muhtemel ên hilbijartina 27'ê Adarê dewletê ditirsîne ku wek referandûmekê were nirxandin
- Hêzên dewletê li Kurdistanê ji bo xerakirina mêzîna hilbijartinê, gel mecbûrî koçê dike
- Nêzîkbûna hindikahiyan (mînorîteyan) a ber bi DEP'ê ve hêzên serwer aciz dike
- Qanûnê Hilbijartinê ya nû şertên helbijartineke demoratîk dixe talûkeyê
- Gefxwarina hêzên leşkerî û "asayişê " li ser berendam û serokên rêxistinên partiya Demokrasiyê li heremê berdewam e
- Livbaziyên kontrayan êdî li navenda Tirkiyeyê jî li hemberî DEP'vanan pêk tên
- Berendamên partiyên rejîma kemalîst ên li Kurdistanê bi giştî cerdevan, kontra, hevkar û pêgirên dewletê ne
- Serlêdanên DEP'ê yên li sazî û rêxistinên navneteweyî badilhewa naçin
- Rayedarên DEP'ê jî di axaftin û daxuyaniyê xwe de didine der ku mercên hilbijartineke demokratîk nemane
- Li heremê dewlet ji bo "man" û "neman"ê têdikoşe

Rûpel 8



*De werin*
*Metirsin*
*Min tenê mehêlin*
*Kevoka jiyanê me ez*
*Ditirsin ji min, hemû mirin...*


*Vekin pencera min*
*Vekin deriyên holika min hûn*
*Tîrêja rojê li min werkin*
*Min bi sehera sibehê ve bişon*
*Guhên min paqij bikin ji qirêjê*
*Da ku sirûda şervanan bibihîzim ez*

*Werin bibin heleq li der û dorê min*
*Ezê ji we re*
*Şevbihêrka şerê şervanên rizgariyê*
*bibêjim...*
*Hûn guh medin qelîstekên rûçikê min*
*Bira çavê minên qulubî bêhna we meçikîne*

*Peyvên min hê gulfiroş in*
*Hê dilê min xort e hevalino*
*De werin...*

**M. Zahir Kayan**

*Li ser navê xwendevanên Welat*
*Xelata 1994'an bo xebatkarên Rojnameya Welat*



**... Tu guh nede nemerdan**
**Bêbext in, derewîn in**
**Wan şerm avêtiye erdê**
**Tu şol bo wan eyb nîn in...**

*Rêber Işik*

*Qedrê gulê çi dizanin?*
*Kerbeş divêt kerê reş... (Ji bo xwefiroşan)*

# Ew ji baweriya me fêm nakin

Xebatkarên rojnameya Welat; niha vê nameyê di Girtîgeha Amedê de dinivîsim. Ez di rojnameya Özgür Gündemê de dixebitim. Ez û hevalekî nûçevan û mêhvanekî me, hatin girtin. 17 roj dibin çavan de man. Dawî em 9 heval avêtin girtîgehê.

Hûn bawer dikin, çiqas tişkekî pirr ne xweş e dema ku nûçevanek bê girtin û bikeve girtîgehê. Piştî ku em avêtine girtîgehê, wek teyrekî çeng şikestî lê me hatiye. Ne qelema te heye û ne makîna te ya sûretan. Weke kerr û lalan li mirov tê. Mirov dixwaze xebata xwe berdewam bike, lê nikare. Mirov weke miriyekî li ser lingan e. Em li ser xwe digerin, lê hema em weke miriyan in. Dibêjin heger em wan biavêjin girtîgehan belkî bitirsin, dev ji rojnameyê berdin. Nizanin ku me sozek ji hevalê **Hafiz** re, **Apê Mûsa**'re ji **Ferhat** re, ji van hevalên xwe yên din re daye. Nizanin bîr û baweriya me ta ku em sax bin winda nabe, wan mirovan hê ev tişt fêm nekirine, an jî naxwazin fêm bikin.

Min di rojnameyê de xwend, digot DED'ê berê xwe daye we jî. Ez we pîroz dikim. Vê yekê baş bizanin; mirov (haşayî we) kûçik be tu kes serê xwe bi mirov re naêşîne. Hemû kes berê xwe didin mirovên baş û qenc. Ewên berê xwe didin rojnameya Welat û Özgür Gündemê, terorê li ser rojnameyên sosyalîst pêk tînin mîna wan kesên ku nikarin bi kerê tep û repê ji kurtên tînin. Li kêmasiya min meyze nekin, lê hema rastî ev e. Ne hewce ye ku ez bidim xuya kirinê, lê car heye ku mirov li ser tiştê ne hewce jî bisekine.

***Nûçevaneke Özgür Gündemê***

## Ji xwendevanên Welat re

*Gelek caran nivîs û nameyên ku jî me re tên, pirr bi derengî di Welat de tên weşandin, ji ber ku zehf caran li postê dest datînin ser û piştî çend mehan jî me re tînin.*
*Em çi bikin, rûyê dijmin reş be.*
*Bimînin di xweşiyê de*

***Rojnameya Welat***

# Nivîsara Welat

## Zimanekî Kurdistanî

Zimanê Welat çawa ye, divê çawa be? Ji destpêka weşandina Welat ve, me serê xwe bi vê pirsê re êşandiye û her çendî me heta cihekî, bersivên vê pirsê dabin jî, bi temamî çareser nebûye û hê jî em li pey in ku zimanekî rast, hevgirtî û hêsan di Welat de bi cih bikin.

Ji bo vê jî, pêdivî bi rexne û pêşniyarên xwendevanên me yên ku bi zimên re eleqedar in, heye. Tiştên ku bi taybetî em li ser disekinin û jê direvin, devokên herêmî ne. Lê tevî vê yekê mixabin, hin kesên ku xwe bi Kurdî re eleqedar dibînin îdîa dikin ku zîmanê Welat herêmî ye.

Rexne ji bo pêşveçûnê pêwist e. Lê ku ev rexne bêbingeh bin hingê ji feydeyê zêdetir zerarê didin. Hin rewşenbîrên ku ji devokê xwe yê herêmî pêştir devokekî din baş nizanin û devokê xwe wek yê rasttirîn dibînin, tevî ku Welat naxwînin, zimanê me wek zimanekî herêmekî dinirxînin û rexne lê digirin. Dema ji wan tê pirsîn "ka Welat dixwînin an na", ku ji Serhedê bin, dibêjin Welat bi devokê Botiyan dinivîse; ku ji Botan bin, dibêjin Welat bi Serhedkî dinivîse û ku ji Xerzan an jî Behdînan bin, Welat bi devokê herêmeke din sûcdar dikin û ji ber vê yekê dibêjin zimanê Welat herêmî ye û sebebê nexwendinê jî bi vê "herêmkiya" Welat ve girê didin.

Em werin ser zimanê Welat. Ev rexneyên ku lê tên kirin, çiqas li cih in? Bi rastî, em bi xwe jî baş dizanin û dibînin ku gelek kêmasiyên me hene. Car caran zimanê hin nivîsên me giran in, dijwar in, wekî din hin hevok di bin tesîra Tirkî de ne. Ji derî wan kêmasiyan gelek çewtiyên teknîkî jî çêdibin. Haya me ji van kêmasiyên me heye û em di nav hewldana ji holê.rakirina wan de ne.

Bes, tevî vê yekê em îdîa dikin ku zimanê Welat ne herêmkî ye. Yên ku vê rexneyê li me dikin, ne xwedî nêrîneke objektîf û zanistî ne. Ji destpêkê ta niha di warê zimên de hewldana me ya mezintirîn jî ew bû ku, em xwe ji devokan dûr bigirin, zimanekî nivîskî yê ji aliyê hemû Kurdan ve were têgihîştin, bi cih bikin. Me xwe bi tu devoka ve girê neda, lê ji peyv û gotinên hemû herêman îstîfade kir, da ku zimanekî xurt û hevpar derkeve holê. Di navenda Welat de ji hemû herêmên Kurdistanê rojnamevan hene. Her yek ji wan bi peyvên herêmên xwe zimanê Welat xurt dikin, lê bi devokên herêmî nanivîsin. Heta ji wan tê bi Kurdiyeke wisa dinivîsin ku ji aliyê hemû Kurdan ve bê fêmkirin. Li aliyê din, ji çar aliyê Kurdistanê nivîskar û xwendevanên me ji me re dinivîsin û ew jî roj bi roj xwe ji devokên xwe xelas dikin, bi forma zimanê Welat dinivîsin.

Bi kurtî em wek zimanê Welat devoka tu herêmî ji xwe re bingeh napejirînin, lê ji peyv û biwêjên hemû hêlên Kurdistanê îstîfade dikin. Li ser bingeha rêzimana ku Celadet Bedirxan daniye, em dixwazin zimanê Welat li ser wê bingehê xurt bikin û hîn jî pêşvetir bibin.

Zimanê me ne herêmkî ye, lê ji hemû devokan îstîfade dike.

Em ne dev ji "wilo" ya Toriyan ne jî, ji "welê" ya Botiyan berdidin. Em ne "wiha" ya Serhedê, ne "werre" ya Riha û Dêrikê, ne jî "wisa" ya Xerzan ji bîr dikin.

Emê peyvên Mêrdînê, axaftinên Culemêrgê, xeberdanên Xerzan, Amed û Serhedê, qiseyên Dihok û Mehabadê, dengkirinên Meletê û Efrînê, şitexeliyên Nisêbîn û Kobanê, qeziyên Dêrsimê, şorên Ruhayê giş bi kar bînin. Ev gotin giş dewlemendiya zimanê me didin der.

Lê bila dilê Botiyan nemîne ku em ji rabûnê re nabêjin rabîn an jî rabun. Divê Serhedê dilê xwe ji me negirin ku em "bîrkirinê", bikin "ji bîrkirin". Lazim e Dêrikî jî hêrs nebin, ji ber ku em ji "ciya min" re dibêjin "diya min". Gava ku Farqînî di şûna "ana" ya xwe de "niha" dîtin bila şaş nebin. Bila Semsûr, Ruhayî û Efrînî li me biborin, dema em di şûna "bavê xwe hat" de bibêjin "bavê wî/wê hat". Hinga, me "dibit"a Behdînaniyan jî veguherte "dibe" pêwist e me sûcdar nekin. Em nizanin Kurdên ku koçberî Konya û Kirşehîrê bûne wê çi bibêjin, wextê em "qepî qepatmîşke" an jî "dengiz"a wan bikin "Derî bigire û derya". Ku Xerzî dev ji "ew diçî" berdin û bibêjin "Ew diçe", Nisêbînê jî nema ji "Tu dixwazî" re bibêjin "Tu dixwaze", wê çêtir bibe bi dîtina me.

Cihê me têrî nake, nexwe hîna pirr mînakên balkêş hene ji bo zelalkirina vê rewşê.

Dawî em vê dibêjin. Werin em zimanekî ne herêmî lê, Kurdistanî û hemdem biafirînin. Werin em rexneyan li hev bigirin, lê rexneyên li cih.

**Mazhar Günbat**

**...........NÛÇEYÊN CENGÊ...........**

# Kurmê darê ji darê ye

■ Kurdistan, her dem ji ber xayintiya hundirê xwe hatiye wêrankirin. Di vê heyama ku em tê de dijîn de, tarîx xwe dubare (tekrar) dike. Çar hawîrê Kurdistanê ji ber pesta hêzên dewletê bi awayekî hovîtî tê valakirin. Lê ya balkêş, cerdevanên dibin alîkarê van kirinan. Edî cerdevan her cure kirinên qirêj li hember gelê Kurd dikin. Raste rast dest diavêjin namûsa xelkê, qereqola ava dikin û kesên welatparêz li wan cihê ku dewletê ji wan re ava kiriye de, dixin bin îşkenceyê. Ev jî ne bes, ew kesên ku dibe keleme çavê wan, ro li nîvro didin ber gulleyan û wan dikujin.

**Navenda Nûçeyan- 2 Reşemî 1994-** Di operasyonên dewletê de 20 leşker mirin. Hêzên leşkerî, piştî operasyona Kampa Zelê, li Culemêrgê (Hekarî) yên Herêma Oramar hevêrka (dever) Bazê, hêzên dewletê bi 600 leşkerî li hember gerîla dest bi operasyonan kir, ji ber sermayê 20 leşker qefilîn û mirin.

Li gundên Banê (Güçlükonak), Xore û Sevdayê ji aliyê kesên nenas ve 2 mal hatine bombekirin, 3 kes (Hakîm Toprak, xwişka wî û Hamît Elîk) hatin kuştin, 5 kes jî birîndar bûn.

Hêzên leşkerî li gundê Pazarcikê (Mereş) Cimikanliyê du kes dan ber gulleyan, Hasan Pelen (21) û bavê wî Mehmet Pelen (37) hatin kuştin.

Gerîlayên ARGK'ê li Navşanê (Şemdînlî) li hevêrka Gerdî, di kontrolkirina rê de 14 cerdevan bin çav kirin.

Li gundê Dêrikê, li Menteşiyê hêzên dewletê Mehmet Aksoy bin çav kir.

**3 Reşemî 1994-** Di operasyona ku dewletê li hevêrka Oramarê û li Çiyayê Qato çêdikir de, aşît (şepe) bi ser leşkeran ve hat, 33 leşker ta niha ji bin aşîtê hatine derxistin. Li hêla din, li eynî hevêrkê 13 leşker ji aliyê guran ve hatine parçekirin. Li gorî Kurd-A'yê di vê operasyonê de 35 leşker mirine.

Di êrîşa gerîla ya li gundê Kercewsê (Gerçuş) Xiroyê de Muxtar Ahmet Aydin, Ramazan Sürücü li Amedê bi êrîşa kesên nenas ve hatine kuştin. Li Amedê jî bombeya destan (narîncok) di destê du leşkeran de teqiya, leşker Recep Yavuz û Ahmet Kenakçi mirin.

Hêzên leşkerî, li gundekî Dihê (Erûh) bi navê Saltana (150 mal) 7 mal şewitandin û mudeta 7 rojan ji bo valakirinê dane wan.

Cizîr wek her caran, dîsa ji aliyê hêzên dewletê ve hate gullebarankirin. Di gullebarankirinê de gelek mal û cihê kar (dikan) xesirîn.

**4 Reşemî 1994-** Gerîlayên ARGK'ê, li Cizîrê girtin ser saziyên dewletê (qereqol, lojmanên polîsan), gelek xesar dan van saziyan.

Li Dêrikê gundê Şevajêrê (Çayköy) jî, di navbera gerîla û leşkeran de şer derket. Li gorî agahiyên jêderên herêmî 30 leşker hatine kuştin. Li dû şer, hêzên dewletê avêtin ser gundê Şevajêr, 30 mal şewitandin.

Muxtarên 30 gundên Hezo (Kozlûk), li hemberî daxwaza leşkeran a ji bo cerdevaniyê tewra xwe bi tevayî rê dan.

Li Pirsûsê hêzên leşkerî, gundiyan bi kotekî mecbûrî koçê dikin. Li gundên Qubînê (Beşîriyê) jî gundî, ji ber zilma dewletê û daxwaza dewletê ya ji bo cerdevaniyê, koç dikin.

Qomutanê Alaya Dêrsimê Kazim Çilliîoğlu, bi mirîtî hate dîtin. Li gorî şîroveya hêzên leşkerî, wî xwe kuştiye. Lê li gorî agahiyên ne fermî, ew ji aliyê hêzên leşkerî ve hatiye kuştin.

Li Amedê, bi êrîşên kesên nenas ve 2 kes (Ömer Güneş û Faruk Baran) hatin kuştin, yek kes jî birîndar bû.

Serokê Partiya Demokrasî yê navenda Dîgorê Mehmt Yardimciel, li Emniyeta Dîgorê hate îşkencekirin.

**5 Reşemî 1994-** Gerîlayên ARGK'ê, avêtin ser gundê Kercewsê Kömürcükê mezraya Botikan (Süleyman), 12 leşker hatin kuştin, cerdevanek û 4 leşker jî hatin birîndarkirin. Di êrîşê de 3 gerîla jî mirin.

Li gundê Tuşluçaya ku li ser Îdirê ye li mezreya Kuleyê, Hüseyîn Çavuş ku bûbû sedema mirina 6 gerîlayan, ji aliyê gerîlayan ve hate kuştin.

Cerdevanên Eşîra Bucakan (Girêsor, Sîwêrek) dest avêtin du xwişkan (yek jê mamoste ye), li dû bihîstina bûyerê hêzên emniyetê, ji mecbûrî herdu cerdevan girtin.

Di operasyona ku hêzên dewletê li gundê Çelê (Çukurca) Guzreş (Cewîzlî), li Zozanê Xanê dest pê kiribû de, 120 leşker û 60 cerdevan winda bûne.

Tîmên taybetî avêtin ser gundê Gogsî (Karayazi), Aşaği Söylemez, 2 zarok dan ber gulleyan. Herdu zarok jî hatin birîndarkirin.

Navenda Partiya Demokrasiyê ya Dîgorê, ji aliyê hin kesên nenas ve hate bombekirin.

**6 Reşemî 1994-** Sekreterê Partiya Demokrasiyê yê Giştî û Berendamê Enqerê Murat Bozlak, ji aliyê kesên nenas ve hate birîndarkirin.

Qumanderê Tabûra Dihê (Erûh) Hüseyîn Kurt, pesta xwe li ser esnaf û gundiyan bi awayekî awarte didomîne.

Hêzên dewletê, bi balefirên leşkerî, êrîş birin ser başûrê Kurdistanê, hevêrka Mezî û Keryadî ta niha li ser vê yekê tu agahî nîn in. Muxabîra Özgür Gündemê ya Îdirê Emîne Serhat, bi birayê xwe Abdullah Serhat ve hatin binçavkirin.

Hêzên dewletê navçeya Hênê dane ber gulleyan. Di gullebarankirinê de 10 xanî, dikanek û otomobîlek hate xesirandin.

Li Pirsûrcê (Suruç) endamên hizbîkontra, êrîşî ser Necatî Polat kirin. Di êrîşê de Necatî Polat hate birîndarkirin.

**7 Reşemî 1994-** Li Botanê 38 leşker hatin kuştin. Li ser riya Şirnexê û Qilabanê (Uludere) leşker ketin kemîna gerîlayan, 12 leşker hatin kuştin û li Silopî wasiteyek leşkerî li mayîna gerîla qelibî 9 leşker mirin. Li aliyê din li Dihê leşker ketin kemîna gerîlayan, 11 leşker mirin. Ji xeynî van bûyeran, hêzên dewletê, li Çelê (Çukurca) devera Avaşînê dest bi operasyonên hewayî û yên bejayî kirin.

Di van operasyonan de jî 6 leşker ji aliyê gerîlayan ve hatin kuştin û gerîlayek jî mir.

Hêzên dewletê li Bedlîs, Dîlûk (Entap) û Mereşê bi dehan kes binçav kirin.

Gerîlayên ARGK'ê, li gundê Diha Dîkboğazê, lawê cerdevanê gund Cemîl Öner, Îzettîn Öner li Edeneyê bin çav kirin.

Hêzên dewletê, cendekê 2 gerîlayan, ku li navçeya Dêrikê di nav hefteyê de bi mirîtî hatibûn bidestxistin, nedan maliyên wan.

**8 Reşemî 1994-** Li Şirnexê mayinek ku gerîla binax kiribû teqiya, 11 leşker mirin. Li Nisêbînê taxa Îstesyonê, gerîla êrîşî qereqolekê kirin, di êrîşê de qereqolê xesar dît û çend leşker hejmar ne diyar e, hatin birîndarkirin. Gerîla li Stewrê (Sawûr) êrîşek birin ser gundekî cerdevanan. Di êrîşê de 2 cerdevan hatin kuştin, 2 kes jî birîndar bûn.

Li gundê Çinarê Xasê (Has), di navbera hêzên leşkerî û yên gerîla de şer derket, gerîlayek û gundiyek mirin, leşkerek jî birîndar bûn.

Gerîlayan, li gundê Mezgirê (Malazgirt) Koyunuşaği jinek, ji ber ku têkilî bi tîmên taybetî re çêdikir, kuştin.

Li Amedê mala polîsekî hate bombekirin, 2 kes birîndar bûn.

Cendekê 3 kesan li nêzîkî Şemrexê (Mazidağ) hatin dîtin. Navê van kesan ev in: Mehmet, Ramazan û Iêzimê wan Ahmet Erek.

Li gelek gundê Licê leşker, li ser navê şervanên ARGK'ê belavokan belav dikin û di van belavokan de Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, tê tewankirin. Du muxtarên gundên Qaqizmanê Yaylakerkê û Akça, ji bo protestokirina pesta dewletê, dev ji mohrên xwe berdan.

Li gundê Çingûşê hejmara cerdevanan, ji ber pest û zilma dewletê, zêde dibe.

Li Amedê, bi êrîşê kesên nenas ve 3 kes hatin birîndarkirin.

---

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Wesiyeta Eliyê Evdirehman

Dema ku Apo (Osman Sebrî) cara dawiyê koça xwe bar kir û xatirê xwe ji me xwest, em li pey wî giriyan. Me li ser wî şoreşgerê nemir helbest, gotar û bîranînên hêja nivîsandin. Em bi çûyîna wî xemgîn bûn, Apo Kurdistan nedît û çû. Dixwest çend salên din jî jiyan bibe, di çend salên din de Apo serxwebûna welêt û azadiya gelê xwe, wê bidîtiba.

Barekî giran da ser milê me. Em di nava berpirsiyariyeke mezin de hiştin. Wesiyeta wî ya şehreza û payebilindî ev bû: **"Ez naxwazim zû bimirim, dilê min Kurdistaneke serbixwe dixwaze. Çend salên din bi min gerek in. Ezê bibînim, xebateke rêkûpêk heye. Lê gava çêbû û ez mirim, Kurdistan jî bindest bû, li ser cenazeyê min gulan daneynin..."**

Apo ji me gulan naxwaze. Mebesta wî tê vê wateyê: Eger hûn ji min hez dikin, Kurdistana ku ez ji bo wê dinalim rizgar bikin. Bixebitin, nesekinin, armanca di dilê min de pêk bînin... Di nava lepên dagirkeran de niştîmanê Medya bêxwedî nehêlin. Bi xebata xwe hûn min di nava gulistanê de vedişêrin...

Doh em li ser Apê Osman giriyan, îro jî em li ser cendekê Apê Elî bêdeng radiwestin. Hîna birîna ku Apo di canê me de hiştibû derman nebûye, **Eliyê Evdirehman** jî pişta xwe da me û çû... Êdî venagere.

> ***Apo ji me gulan naxwaze. Mebesta wî tê vê wateyê: Eger hûn ji min hez dikin, Kurdistana ku ez ji bo wê dinalim rizgar bikin. Bixebitin, nesekinin, armanca di dilê min de pêk bînin... Di nava lepên dagirkeran de niştîmanê Medya bêxwedî nehêlin. Bi xebata xwe hûn min di nava gulistanê de vedişêrin...***

Nivîskar, hozanvan, romannivîs û rojnamevanê Kurd ê niştimanperwer Eliyê Evdirehman; min carekê tenê dîtibû. Li Başûrê Kurdistanê ez di civîneke wî de amade bûm, hîna xweşiya wê civînê ji bîra min neçûye.

Jiyana Eliyê nemir bi serê xwe destanek bû. Ji sala 1920'an ta 21.10.1994'an, di 74 salên xerîbiyê de destana jiyana Apê Elî, serpêhatiyê dîrokî ye. Serpêhatiya dûrbûna ji welêt, êşa sirgûniyê û romana keser û ahînan e.

Kurê sirgûnê Apê Elî, tevî ku ji welêt dûr bû jî, jê qut nedibû. Pê re jiyan dibû, pê re diêşiya û pê re li ber xwe dida. Her sal dihate welêt. Her demê jî mesaja wî ji gel re ev bû: **"... Di nava we de bêhna min fireh dibe, ez ciwan dibim, azadiyê dibînim, xwezî di nava we de bimirama..."**

Belê, çend salan berî niha. Min ew li Başûr dît. Hatibû gora **Seydayê Cegerxwîn** ziyaret bike. Ew cara yekemîn bû ku ez wî dibînim. Tenê min helbest û hinek nivîsên xwe Apê Elî di kovar û rojnameyan de xwendibû. Min welatheziya wî di wan berhemên nirxdar de didît. Lêkolînvanan ew wiha dinirxandin: **Elî ji torevanakî bêhtir welatparêzekî mezin e...**

Şeveke biharê bû. Li maleke welatparêz bûbû mêvan, di nava civînekê de rûniştibû. Nêzîkî bîst kesan, xwe li dora wî civandibûn û bi balkêşî li axaftina wî guhdar dikirin, Apê Elî parçeyek ji romaneke xwe ji wan re dixwend.

Em rûniştin. Gelekî ji ciwanan hez dikir, bi taybetî jî yên welatparêz û toreperwer. Ji me re bi uslûba romannivîsekî, çîroka xwe û sirgûniya li ser riyan got. Giriya: **"Derdê me giran e. Em birîndar in, êdî birîn kevin bûye. Ev heftê sal in ez wê êşê dikişînim. Şev bi min ne şev e, roj bi min ne roj e. Min tiştek ji vê dinyayê fêm nekir..."**

Mêrekî wisa bejinbilind, ziman şîrîn, devliken û navsaliyekî ciwan bû. Serê xwe rakir, li me meyizand û got: **"Min wisa biçûk nebînin, ez Eliyê Kurdistanê me. Bixebitin, emê meqseda xwe nêzîk bibînin. Heke min nedît jî, ev wesiyeta min ji we re heye. Dema ez mirim berê serê min bidin Çiyayê Agirî. Li ser cenazeyê min bisekinin û sê caran bang bikin Agirî.. Agirî.. Agirî!. Elî bi hesreta te çû..."**

Serê gelê Kurd û malbata nemir Eliyê Evdirrehman sax be.

**Not:** Di nivîsa, hejmar:103 ya kuncikê Hawar de gelek çewtiyên çapê hebûn. Sernivîs (Kesereke din...) ne (kesek...) wekî din gelek guhertinên hevok, gotin, rêziman û rênivîsê tê de çêbûne.

**Em ji hevalê Dilbixwîn û xwendevanên xwe lêborînê dixwazin.**

*Rapora Rêxistina Efûyê:*

## Hevkariya hêzên dewletê û Loyalîstan heye

**Nûçeyên Derve–** Roja 9'ê Reşemiyê, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî ji hikûmeta Brîtanyayê xwest ku, li ser îdîaya hevkariya hêzên ewlekarî û rêxistinên Loyalîst (reşkujên protestan) ya li bakurê Îrlandayê bisekine.

Li gorî raporeke vê rêxistinê, di warê vê hevkariyê de gelek belge hene. Ev rêxistinên ku, li bakurê Îrlandayê mirovên sivîl dikujin, li dijî azadîxwazên Îrlandî şer dikin û naxwazin ji Îngilîtereyê veqetin.

Yek ji van Komela Parastina Ulsterê ye, ev rêxistin wek kontr–gerîla dixebitin û ji 1992 bi vir ve livbaziyên wan yên li dijî mirovên sivîl pirr zêde dibin. Ji ber vê yekê jî aliyê hikûmetê ve hatin qedexekirin. Lê tê gotin ku têkiliyê hêzên dewletê bi van rêxistinan re didome.

## Yûnanîstan serokên cûntayê efû nake

**Nûçeyên Derve–** Li gorî nûçeyeke Ajansa Reuterê ku roja 9'ê Reşemiyê de, Wezîrê Karê Dadiyê daxwaza hinek endemên cûntaya 74'an e ji ber sedemên tendurustiyê redand.

Komîteyeke Wezareta Karê Dadiyê, daxwaza Stylianoş, George Zoîtakîs, Nîkolas Makarezos û Ayoannîs Ladas ji bo efûyê şînve zivirand.

Ev çar kes bi cezayê heta hetayê hatine cezakirin û serokên cûntaya ku ji 1967'an heta 1974'an li ser kar mabûn, di sala 1975'an de bi sûcê îxaneta mezin hatin cezakirin.

Wek tê zanîn hewldana hikûmeta Muhafazakar, ku van li ser navê mafê mirovan serbest berde, ji gel berpeyiyek tund dît. Serokê cûntayê George Papadopoulos jî, bi vî cezayî hatiye cezakirin, lê ev, qet efûyê naxwaze û dibêje: "Dîktaya min rê li ber komunîzmê girt li Yûnanîstanê."

## NASNAMEYA BOSNA–HERSEK

Peyva Bosnayê ji navê çemê Bosnayê tê, Hersek jî peyveke Almanî ye, wateya vê peyvê "Mîrîtî" ye. Ev komar heta hilweşîna Yugoslavyayê yek ji şeş komarên federalî ya vê dewletê bû.

Bosna–Hersek di sedsala bîstan de derket holê wek hebûnek bi serê xwe û ji Sirbîstanê veqetî. Gelê Boşnak ne Slav e, qewmekî Îndo–Ewrûpayî ye, berî hatina qewmê Slavîk li wir bûye. Heta dagirkirina cihêreng dîtine. Ev der di sala 1908'an de ji dest Tirkan derdikeve, lê ola Îslam ji wan re wek diyariyeke Osmaniyan ma, li Balkanan tenê li wir dînê Îslam bi awayekî girseyî hatiye pejirandin. Mîrên Bosna–Hersek wek hevkarên Osmaniyan hatine binavkirin. Piştî ku ji dest Osmaniyan diçe, ev dever dikeve bin hikmê Avusturya–Macarîstanê û bû sê beşên hilbijartinê, li ser bingeha civata olî, ortodoks, katolîk û misilman. Ev herêm di sala 1918'an heta 1946'an ket bin desthilatdariya Sirpan, 1946'an de komarên Yugoslavya ava bû. Bosna–Hersek jî bû komareke federalî endamê Komarên Federalî yên Yugoslavyayê bû. Di sala 1991'an de 6 komarên Yugoslavya jî hev veqetîn û serbixwe bûn. Di Tîrmeha 1991'an de jî, li Bosna–Hersekê şerê di navbera misilman, Sirp û Hirvatan de dest pê kir. Heta niha di vî şerî de nêzîkî 200 hezar kesî can daye, 20 milyon kes bêmal in.




Paytexta Bosnayê Saraybosna ye û niha ji aliyê Sirpan ve hatiye dorpêçkirin. Nifûsa Bosnayê li gorî hejmarên berî şer, nêzî deh milyonan e û berfirehiya erdê vê komarê 51.129 km kare ye.

Saraybosnaya ku niha hatiye dorpêçkirin û qewimînên xedar lê çêdibin, berê cihê navendî ya serokatiya sê olên li Yugoslavyayê bû; Serokên misilmanan, Ortodoksan û Mitranê Katolîkan.

Berî şer, aboriyan Bosnayê li ser hinek hilberiyên çandînî wek; genim, sebze (bi taybetî kartol), kamîşa şekir, qedek (kitan), titûn û hilberiyên pîşesaziyê wek, hesin, pola, titûn, şekir, cerm.

# Li Saraybosnayê qirkirina sivîlan

■ **Şerê li Bosnayê roj bi roj qetilkirina mirovên sîvîl û bêguneh bi xwe re tîne. Ji vî şerî ne tenê sivîlên misilman, hemû mirovên li wir zirarê dibînin. Armanca hemû aliyên şer paqijkirina herêmê etnîkî ye. Hêzên împeryalîst ev agir vêxistin û niha jî xwe li ber germ dikin.**

**Samî Tan**

Bi bûyera ku roja şemiyê, li paytexta Bosna–Hersekê qewimî, şerê li wir dîsa di rojeva dinê de hilperikî rêza pêşîn. Ev êrîşa herî tund ya li dijî mirovên sîvîl pêk hat, gelek pirs û gengeşî jî bi xwe re anîn. Bi parçebûna Yugoslavyayê şerê di navbera Boşnak, Hirvat û Sirpan de dest pê kir. Sîstema federalî li Yugoslavyayê bi awayekî demokratîk dihate meşandin. Serokatî bi dorvegerî diket destê komaran, di sala 1991'an de li ser dorgeriyê li hev nekirin. Piştî referandûmekê Yugoslavya parçe bû, lê sîstema federalî rê li ber komarê neteweyî digire, ji ber ku di vê sîstemê de gel bi rehetî cihê xwe diguhêrand, ev jî bû sedema tevlîhevbûnê: Jixwe berî vê jî neteweyên serbixwe li vê herêmê bi rêk û pêk derneketibûn holê. Gelê vê herêmê her tim di bin hikûmdariya împaratorên pirr olî û pirr qewmî de maye. Ji vî alî ve komara herî tevîhev Bosna–Hersek e, ji ber vê yekê şer bi giranî li vir diqewime. Piştî serxwebûna vê komarê, Sirpên li vir serî rakirin û bi alîkariya Sirbîstanê şerekî dijwar dimeşînin. Ev bû du sal paytexta Bosnayê ji aliyê van ve hatiye dorpêçkirin. Ev dixwazin ku parçeyekî ji vê komarê veqetînin. Li aliyê din di navbera Hirvat û Sirpan de, di navbera misilman û Sirpan de û di navbera misilman û misilmanan de jî şer heye. Giş dixwazin cihekî ji yên din paqij bikin û hikûmdariya xwe li ser ava bikin.

Desthilatdarên Bosnayê ji cihekî serwer ku li bakûr digihîje çemê Sava û li başûr heta Bahra Adriyatîkê ye, dixwazin, lê di nav sînorê ku ev dixwazin de nêzî 5 navçe ji aliyê Sirpan ve hatiye bidestxistin û ji aliyê etnîkî ve hatiye paqijkirin jî.

Roja 5'ê Reşemiyê li Saraybosnayê roja bazarê bû, gel ji bo ku pêdiviyên xwe bikire çûbûn cihê bazarê, guleyek topa hawanê li cihê bazarê ket li wir 66 kes mirin, zêdetir 200 kes jî birîndar bûn.

Ev bûyer weke hovîtiyeke mezin hate nirxandin. Sirpan ev tişt hilneda ser xwe, lê herkesî ev bûyer li wan bar kir. Serokê Bosnayê Îzet Aliya Begoviç wiha got: "Armanca van ne şerê li dijî hêzên me yên leşkerî ye, lê zêdetir kuştina mirovên me yên sîvîl e, daxuyand ku ev dê beşdarî civîna li Cenevreyê ya ku di navbera misilman, Hirvat û Sirpan de çêdibe nebin. Pişt re got: "Divê çekan bidin me ku em xwe biparêzin."

Bi qewimîna vê bûyerê, mudexaleya NATO'yê careke din hate rojevê, lê hêzên împeryalîst li ser vê yekê li hev nakin û naxwazin rasterast têkevin nava şer. Ne dikarin dorpêça li ser Saraybosnayê rakin û ne dikarin daxwazên Sirpan ji bo parçekirina herêmê bînin cih. Tirkiye ji aliyekî ve bi awayekî nependî çekan dide misilmanan, Rûsya jî dide Sirbîstanê, yên ku zêdetir ji vî şerê neheq zirarê dibînin, mirovên sîvîl in. Di vî şerî de her celeb hovîtî tê bi kar anîn: Îşkence, reşkujî, tecavuz û hwd. Li gorî hinek çavkaniyan, sebebeke vê êrîşê jî serdana Tansu Çîller û Benazîr Bûtto, ku sê rojan berî êrîşê pêk hat, bû.



*Li nexweşxaneyê sivîlên ku di êrîşa ser Marketê de birîndar bûne.*



Cerdevan ne bi tenê rahiştine çekan, êdî tevî malbatên xwe ve di xwepêşandanên li dijî PKK'êde bi awayekî çalak cih distînin.

# Xwepêşandana ku negihîşt armancê

**Navenda Nûçeyan-** Di van mehên dawî de dewlet dest diavêje azîneyên (metodên) ecêb. Di gel şerê çekdarî yê li hemberî gerîlayên PKK'ê, şerê xwe yê psîkolojîk jî tund û gurr dike. Êdî bi fermana "Waliyê Herêma Rêveberiya Taybetî" Ünal Erkan ve, livbaziyên xwepêşandanî li dijî PKK'ê li dar dikevin. Roja 6'ê Reşemiyê livbaziyeke bi vî cureyî li Amedê, bi beşdariya 250 kesan ve pêk hat.

Xwepêşandanên ku bi hinceta "lanetkirina" PKK'ê li dar dikevin, serê pêşî bi cerdevanan (cehşikan) ve qewimîn. Cerdevan tevî malbatên xwe, bi jin û zarokan û bi alên Komara Tirk ve li dijî PKK'ê li Şirnexê meşiyan. Pişt re li Cizîrê ev cure livbazî çêbûn. Lê bi tenê beşdarbûna malbatên cerdevan, polîs, MÎT û hêzên dewletê dixuye ku têr nekiriye. Dewleta Tirk cara pêşîn xwest li Mûşê di 10'ê Sermaweza 1993'yan de xwepêşandineke mezin li dijî Partiya Karkerên Kurdistanê biqewimîne. Li ser vê daxwazê, pêkutî li gundiyên Mûşê û navçeyên wê kir ku beşdar bibin. Ji aliyê leşkeriyê ve gef li wan hate xwarin, heke beşdar nebin dê malên wan bi carekê dê bête şewitandin.

Li Mûşê xwepêşandan di 10'ê wê mehê de çênebû, lê çendekî di pey de li dar ket. Her çiqas malbatên cerdevan, polîs û hêzên dewletê tevî eşîrên pêgirên wê û rêxistina partiya Alpaslan Türkeş MHP beşdar bûn jî, encam ji bo wan neyênî bû.

Komara Tirk li bajarê Amedê jî di 6'ê Reşemiyê de livbaziyeke bi vî rengî li dar xist. Bes vê carê bêhtir xwe hesikand. Ji bo amadekirina vê xwepêşandanê, tehde û xedra ku li gundên navenda Amedê hate kirin û gefên ku li wan hate xwarin li aliyê din, cerdevanên wan jî başe baş tevî vê livbaziyê nebûn.

Xwepêşandana ku li Amedê çêbû ku bi fermana Waliyê Herêmê bû, tevî hev 250 kes beşdar bûn û di livbaziyê de bûyerên pêkenokî jî qewimîn. Zarokên ku beşdarî mitînga li dijî PKK'ê bûbûn, slogana ku li hemberî PKK'ê biqîriyana li dijî MHP'ê qîriyan, slogana wan wiha bû: **"Bijî PKK, bimire MHP".**

Ev livbaziya ku bi beşdariya cerdevanên ji **Cizîrê, Şirnexê, Midyadê** û **Siwêrekê Eşîra Bûcakan** û tevî malbatên hêzên dewletê li Derê Ruhayê pêk hat, li îstasyonê qediya. Di meşê de ev slogan dihatin qîrkirin: "Diyarbekir wê li PKK'ê bibe goristan", "Zelê şirqamek xwar, bila silav be", "PKK wê biqede û biqeşite here", "Bimire parvexwaz", "Dewlet û milet dest bi dest".

Di dema livbaziyê de Serokê MHP'a Amedê **Îbrahîm Yiğit** bi axaftinên xwe yên dînî, polîs jî bi pêgirtin û kaşkirina temaşevanan bala gel kişandin ser xwe û ev kirinên wan jî bênetîce man. Dewletê ji bo pêkanîna vê xwepêşandanê gelek xedarî li gundiyên Amedê kiribû, bi erebeyan ji navçe û bajarên Amedê kesên faşîst û cerdevan anîbûn. Lewre di dema xwepêşandanê de hem kesên bi maske û yên ku îşareta MHP'vanan dikir, dixuyan.

# Li Cizîrê lîstikên dewletê

**Navenda Nûçeyan-** Hêzên dewletê piştî hilweşandina Şirnex û Îdilê, dest bi tarûmarkirina Cizîrê dikin. Ev çend hefte ne, êrîşên dorfireh li Cizîrê tînin pê. Wisa tê xuyan ku dewlet li Cizîrê li pey hinek tiştan e. Ta niha bi kuştin û girtinan ve, bi çavtirsandinan ve li ser gelê Cizîrê teroreke dijwar didomand. Armanca wan ew bû ku xurtbûna têkoşîna neteweya gelê Kurd qels bikin. Ji bo vê ramanê ji destê wan çi hat kirin. Exleb bi terora cerdevanên Kamîl Atak projeyên xwe li dar xistin. Dixwazin Kurdan bi Kurdan bidin qirkirin. Der û dorên Cizîrê cihên ne li gorî wan hatine valakirin, bi demek şûn ve ev rewş li Cizîrê jî çêbû. Dewlet bi rêk û pêk gel ji Cizîrê dide qewitandin. Dixwazin ku têkiliya gerîla û gel ji hev biqetînin.

Ev çend roj in jî, der barê Cizîrê de hinek agahiyên cihêreng dikevine destê me. Lewre daxwazî û projeyên dewletê her car ji bo Cizîrê têtê guhertin. Hilibjartin roj bi roj nêzîk dibe, dewlet li Kurdistanê û li Cizêrê li pey hinek tiştan e. Dixwaze Sercerdevan Kamîl Atak ji Cizîrê re têxe Serokê Belediyeyê. Ji bo vê teroreke xurt li ser gel didomîne. Cerdevan her car êrîş dibin ser taxên Cizîrê û li wan îşkence dikin. Ji wan re: "Yan hûnê rayên xwe bidin Kamîl Atak, yan jî hûnê koç bikin" dibêjin. Ta niha zêdeyî 200 malbat ji Cizîrê koç kirine, cihê ku malbat jê derdikevin, cerdevan tê de bi cih dibin. Mebûsê Şirnexê Selîm Sadak di axaftina xwe de, "Ta niha li gelek deverên Kurdistanê bi pirranî kes reyên xwe neavêtine. Ev hejmar sirf li Cizîrê sê hezar e" got. Ji aliyekî din ve li Cizîrê di navbera mehekî de 16 kes hatine kuştin. Wisa tê xuyan ku dewlet bi gelek lîstikan û pêkanînên neheq ve dixwaze encama hilbijartinê ji bo armancên xwe biguherîne.

## Banga boykotkirina tûrîzma Tirkiyeyê

Rêxistinên Aşitî yên Swîsra ( SFFF û Friedens Bewegung) ji bo tûrîzma Tirkiyeyê, biryara boykotkirinê standin û dest bi xebatê kirin. Di xebata van rêxistinan de, sedema vê yekê jî, şerê ku dewleta Tirkiyeyê li dijî gelê Kurd dimeşîne tê rêdan. Rêxistinên aştîxwaz, ji tûrîstên ku wê biçin Tirkiyeyê re jî wiha dibêjin: "Ku her pereyê tûrîstek li Tirkiyeyê dihêle, li Kurdistanê dibe çek û li dijî gelê Kurd tê bikaranîn."

## Mahkemeya 'Weqfa Maf û Azadiyên Kurd'

Weqfa Maf û Azadiyên Kurd, ji bo nav û bernameya xwe, ji aliyê Dadgeha Hiqûqa Asliye (Beyoğlu) nimro 3 ve dawe hatibû vekirin û ji bo vê yekê 'tescîl'kirina weqfê bi derengî ketibû.

Dadgehê di danişîna xwe ya 9'ê Reşemiyê de, biryara tescîlkirinê, bi şertê ku weqf heta 9'ê Adarê 300 milyon TL. li bankê razîne, da. Bi vê biryarê jî hat xuyakirin ku weqfê, ji aliyê hiqûqî ve mafê tescîlkirinê wergirtiye.

## Munîr Ceylan û Komîsyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê



Serokê Sendîkaya Petrol-İş'ê Munîr Ceylan, ji ber cezayê ku Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (ÎDGM) dabûyê (20 meh), serlêdanek li Komisyona Mafên Mirovan a Ewrûpayê kir. Ceylan, sedemê vê hewldanê jî hiqûqa ku li Tirkiyeyê xetimiye, rê dide.

Ji hêla din cezayê ku li Munîr Ceylan hatiye birrîn 4 meh hate taloqkirin. Li gorî vê taloqê wê Ceylan di 9'ê Pûşberê de têkeve girtîgehê.

## Azadî kom kirin

Hejmara rojnameya hefteyî Azadî ya 91. (5-12 Reşemî) ji aliyê Dadgeha Ewlekariya Dewletê-Stenbolê (DGM) nemro 3 ve hate berhevkirin.

Xwediyê rojnameyê Behram Alabay, bi nivîskî der heqê berhevkirinê de ev şîrove kir: "Dewlet, ji azadiya gel a mafê nûçehînbûnê re, her gav astengan derdixe. Ji bo ji nav neçariya ku ketiyê derkeve, êrîşên wiha dibe ser dorhawira xwe."


Rojname, ji ber nivîsên rûpela 1, 8 û 12 ve hate berhevkirin.



Canan Karakaş



Îbrahîm Bozgîl



Cemal Turan



Fikriye Aktaş



Şemsettîn Kara

## *Kurdên ku daxwaza vebûna kursên Kurdî dikin:*

# 'Em dixwazin bi zimanê Welat fêrî Kurdî bibin'

**Ev heftiya sisêyan e ku em daxwazên kesên ku kursên zimanê Kurdî dixwazin diweşînin. Di vê lêpirsîna me de diyar dibe ku vebûna kursan zehf tê xwestin.**

*Çawa hûn didin xuyan, hûn dixwazin bibin endamê DEP'ê, ev tişt çi ye ku wisa we bi ser DEP'ê ve dikişîne?*

**Abdulselam Kîlkayat–Asam Algan:** Tiştê ku me bi ser DEP'ê ve dikişîne ji nişka ve ji xew hişyarbûna me ye. Me nêrî ku em Kurd in û tu feydeya me negihîştiye Kurd û Kurdistanê û em tim ji Kurdîtiyê dûr mane, ev e ku me bi ser DEP'ê ve dikişîne. Lê ji niha pê ve em dixwazin ji Kurdîtiyê re bixebitin.

*Ev xewna we ya ku hûn bi nişka ve hişyar bûn, dibe ku sedema zilm û zorî û neheqiyê be li ser we?*

**Asan Algan:** Em dinêrin ku li aliyê (Kurdistan) me û li vir tim li ser me zilm dibe. Wellew dewlet dixwaze ku me winda bike, lê em tu caran winda nabin, yek ji me winda bibe, sed ji me têkilî Kurdîtiyê dibin.

*Pirseke me li ser zimên heye, gel daxwaza kursan dike, dîtinên we çi ne û hûn ji weşanên Kurdî çiqas agahdar in?*

**Abdulselam:** Weşanên Kurdî...?

*Weşanên Kurdî, pirtûkên Kurdî, mesela ev rojnameya Welat weşaneke Kurdî ye.*

**Abdulselam:** Ez hêj nû vê rojnameyê dibînim û min eciband.

*Tu dizanî bi Kurdî bixwînî?*

– Belê, ez xwendina bi Kurdî li Sûriyê fêr bûm. Ez ji pirtûka hunermendekî Kurd fêr bûm, niha navê wî nayê bîra min. Şivan helbestên wî distre.

*Mamoste Cegerxwîn!*

– Erê, Cegerxwîn. Lê dîsa jî ez rind nizanim, divê bi pêş ve bixînim.

*Dîtinên we li ser vebûna kursên zimên çi ne?*

**Abdulselam–Asan:** Vebûna kursan tiştekî zehf rind e û ya yekemîn em dê xwe ji kursan re binivîsînin û têkildar bibin.

*Ev çendeyeke ku ji komîsyonên DEP'an daxwaziyên vebûna kursên zimanê Kurdî tê kirin, daxwaza komîsyona we çi ye?*

**Fîkriye Aktaş (Sekretera DEP'a Fatîh):** Pêşî feydeya kursê ji kultura me re hebe, ku em ji xwe re bibêjin nîştimanperwer, divê em kultura xwe fêr bibin, ziman jî kultura me ye.

*Hûn sirf ji bo kulturê dixwazin Kurdî fêr bibin?*

– Na. Nexêr, ne tenê ji bo kulturê, ji bo ku zimanê me ye jî. Mirov bi zimanê zikmakî bêhtir dikare pirsgirêkên xwe bîne zimên.

*Ku ne bi zimanê zikmakî be hûn nikarin pirsgirêkên xwe bînin zimên?*

– Belê, ez dikarim bînim zimên, lê çêtir e ku mirov bi zimanê xwe yê zikmakî bîne zimên.

*Hûn komîsyona DEP'a Beyoğlu berî jî we daxwaza kursa zimên kiriye, we ji kîjan saziyên Kurdî kiriye?*

– Me daxwaza xwe, ji xebatkareke rojnameya Welat re anîbû zimên.

*Ji xeynî rojnameya Welat saziyên Kurdî hene, mînak wek NÇM (Navenda Çanda Mezopotamya) û Enstutiya Kurdî, ji ber çi hûn ji van saziyan daxwaz nakin?*

– Rojnameya Welat Kurdiyeke ku em jê fêm dikin dinivîsîne û diweşîne. Em dixwazin bi stîla rojnameya Welat fêr bibin.




Avdulselam Kîlkaya–Asam Alğan

*Em dikarin çend pirsan li ser zimanê Kurdî ji te bikin?*

– Fermo.

*Gel daxwaza vebûna kursa zimanê Kurdî dike, li ser vê tu dikarî dîtinên xwe ji me re bibêjî?*

**Îbrahîm Bozgîl (Tekstîlvan):** Jixwe kursa zimên li NÇM'ê heye, vebûna kursan ez baştir dibînim. Ji ber ku her Kurdek nikare xwe bigihîjîne NÇM'ê. Ku li gelek deverên din vebin dê ji gel re hêsantir bibe û xwendekar jî dê zêdetir bibin.

*Tu bi Kurdî dizanî binivîsînî û bixwînî?*

– Belê, ez dizanim bixwînim û binivîsînim, lê xwişk û birayê min nizanin. Ez bi îmkanên xwe fêr bûme, xwişk û birayên me jî bi îmkanên saziyên Kurdî fêr bibin, em dê gelek kêfxweş bibin.

*Ev demek e ku hûn daxwaza vebûna kursan dikin, daxwaza we ya vebûna kursa zimanê Kurdî ji ber çi sedemê ye?*

**Cemal Turan (Rêveberiya DEP'a Beyoğlu):** Daxwaza me ji berê ve heye. Wek Rojnameya Welat weşana Kurdî heye û ev ne navgîna fêrbûna zimên e. Ez hinek zanim bi Kurdî bixwînim û binivîsînim, lê nayê wê wateyê ku ez mamoste me. Gelek xwendevanên rojnameya Welat tên ji min dipirsin ev peyv tê çi wateyê. Ez bi xwe jî gelek peyvan nizanim çi wateyê wan hene. Mînak "Taybet û Taybetî" Dawî min ji xebatkareke rojnameya Welat pirsî û fêr bûm. Peyvên bi vî rengî pirr in, bi vebûna kursa zimên ez bawer im dê ev astengî ji holê rabin.

*Hûn li ku dixwazin kursên zimên vebin?*

– Îro navçeyên DEP'an minasib in ji dana dersê zimên re, jixwe ku li deverên din vebin dewlet destûr nade û zimanê Kurdî hê jî qedexe ye.

*Li navçeyên DEP'an dewlet destûr dide ku kursên zimên vebin?*

– Li navçeyên DEP'an bi her awayî em dikarin karê siyasî û kulturî bikin. Ne tenê Kurdî, em dikarin Lazî û İngilîzî jî vekin. Helbet dewlet dê bixwaze bibe çeper ji vê xebatê re, lê divê em li ber xwe bidin û xebatên xwe bi pêş ve bibin.

*Komek Mêvan li DEP'a Beyoğlu me dîtin û fikrên wan wergirtin. Wan mêvanên han jî digotin bi her awayê demokratîk divê zimanê her gelî azad bibe û dibistanên wan hebin. Her gel mafê wî heye ku zimanê xwe û kultura xwe bizanibe, ku nizanibe jî divê fêr bibe.*

*Ev Kurdên ku asîmile bûne, kêm bi Kurdî zanin, yan jî dizanin, lê nizanin bixwînin û binivîsînin. Ev Kurdên han daxwaza vebûna kursa zimanê Kurdî dikin, hûn li ser vê çi difikirin?*

**Şemsettîn Kara (Deftergirê (Sayman) DEP'a bajêrê Stenbolê):** Welle daxwaza me ew e, ku Kurd tev bi zimanê xwe bizanibin. Ta niha nivîs û xwendina Kurdî tune bû. Hinek Kurd zimanê xwe ji bîr kirin, hinek jî asîmile bûn û tu fersendên wan tune bûn ku zimanê xwe bixwînin û binivîsînin. Heke kursên ziman vebin, wê bibe fersendeke baş ji bo Kurdên ku asîmile bûne û zimanê xwe ji bîr kirine re. A duduyan jî dê pirsgirêka devokan jî wê ji holê rabe. Ji ber ku gelek kes gazinan dikin ku ev peyv ne yê aliyê wan e û ew nizanin, yan jî fêm nakin. Lê gazineke me jî, ji Kurdan ev e ku gelek Kurd bi Kurdî dizanin lê, bi Tirkî bi zarokên xwe re diaxivin û zarokên xwe wek Tirkan mezin dikin. Ev çewtiyeke zehf mezin e. Li civînan jî, tim bi Tirkî tê axaftin ev ne baş e. Ji ber ku li civînan gelek pîrekên Kurd hene, bi Tirkî nizanin û nizanin çi hate gotin. Mînak: Ez li civîneke DEP'ê bi Kurdî axivîm, dewletê min daye dadgehê (mehkemê) lê divê em bi van tiştan netirsin û têkoşîna xwe bidomînin. Vebûna kursên zimanê Kurdî min dilşa dike.

*Tu wek karmenda rêveberiya DEP'a bajarê Stenbolê li ser vebûna kursa zimanê Kurdî çi difikirî?*

**Canan Karakaş (Rêveberiya DEP'a bajarê Stenbolê):** Jixwe mêrê min Kurd e û li NÇM'ê (Navenda Çanda Mezopotamya) kar dike. Ez jî dixwazim Kurdî fêr bibim, zarokê min jî diçe NÇM'ê, ew li wir dersên Kurdî werdigire. Sedemeke daxwaza min fêrbûna Kurdî ew e ku, ez dixwazim bi jinên Kurd re bikevim dîalogê. Jinên Kurdên ku xwe li malên xwe hepis kirine û tu agahiyên wan ji dinyayê tune ye.

*Te got ku mêrê te Kurd e, ma tu ne Kurd î?*

– Nexêr, ez ne Kurd im. Ez Ereb im.

*Tu Erebê kîjan deverê yî?*

– Ez Erebê Hatayê me.

*Exlebî Erebên Hatay Kurd in û ji Sûriyeyê ne, dibe ku tu jî, ji wan bî?*

– Na, ez xalis Ereb im. Bavê min Erebê Erebîstanê ye û diya min jî, ji Sûriyê ye.

*Tu xebata saziyên Kurdan çawa dibînî?*

– Ez xebata saziyên Kurdan gelek baş dibînim, nexasim vê pêlê gelek baş dimeşe.

*Xebata Kurdan feyde dide grubên din ên etnîk jî, wek ziman û kultur?*

– Belê, xebata Kurdan feydeyê pêşkêşî grubên etnîkî dike. Mînak: Em di van demên dawî de kovarek bi navê "Ognî" ya Lazan derket. Ev pêşketinek e bi piştgiriya Kurdan. Vebûna kursa zimanê Kurdî dê min ji Kurdan zehftir kêfxweş bike.

**Hevpeyvîn: S.S. Dilpolo**

## Neqtik

*Ew gelê ku azad jî dayîka xwe bû, êdî çawa hûn dikarin bikin kole.*

***Omerê kurê Xetab***

## KÊ ÇI PEKAND?

**"E m naxwazin mirovan bikujin"**

*Doğan Güreş*
*Serokê Artêşa Tirk*



# Hecî û Sultan

Sultan, navê zilamekî ye. Lê li Sultan hewl çêbûye û dîn bûye. An ku aqilê wî kêm bûye. Li Dêrikê hemû kes wî nas dikin.

Rojekê Sultan ji malê tê û diçe sûkê. Tê texma Kaniya Gûzê, ê mirovek bi navê xwe Hecî li pey bûye. Zilamekî din jî xwe di qorziyekê de veşartiye. Zilamê ku xwe veşartiye, ji nişka ve şujikekî (xîçikekî) diavêje Sultan û li serê wî dikeve. Sultan li paş xwe dizivire û dinihêre ku li pey wî Hecî tê. Bi ser Hecî ve diçe. Hecî, dibêje ku ne ew e, an ku wî şujik neavêtiye. Sultan ji xwe re dibêje, **"Hela hela hela"** û di ber xwe de dîsa dimeşe.

Sultan çend gavan diavêje dîsa yê xwe veşartiye şujikekî din diavêje li serê Sultan dixe. Dîsa li pişt xwe dizîvire, dinihêre ku ji Hecî pê ve tu kes tune ye. Hecî destê xwe bilind dike, pê de fêmkirin ku ne ew e. Şultan di ber xwe de, **"Hela hela, hela hela"** dibêje û dest bi meşa xwe dike. Bi vî tewrî carek din jî şujik diavêjê. Sultan zehf diqehire û bi hêrs li paş xwe vedigere, li Hecî dinihêre û dibêje: **"Ey Hecî ezê di diya kê n... Hele ji min re bibêje."** Hecî ji kenan lal dibe ku nikare bersiva Sultan bide. Sultan bi pirsa xwe pê dide zanîn ku ji wî pê ve kes li pişt wî nîn e.

***Medî***

## Jûjî... Doğan Güzel




# 'Ma lawo DEP jî heye?'

Rojekê ez li Stenbolê, li avahiya DEP'ê ya navçeyekê rûniştibûm. Gelek mirov diçûn, dihatin. Gelek mirov jî li hundir rûniştibûn, galegal dikirin. Du mirov li hemberî min, rojnameya Gündem'ê di destê yekî de hem sohbet dikirin, hem jî çavên xwe li rojnameyê digerandin. Çavê wan li nûçeyekê ket, nûçe li ser nasname kontrolkirina ARGK'ê ya li İkitelliya Stenbolê bû. Dema nûçe xwendin pirr kêfxweş bûn û pesnê gerîla û PKK'ê dan. Pişt re yekî got: **"Lawo ev DEP çi partî ye? Me tu livbaziyên wê nebihîstin, ne bombeyek, ne êrîşek, ne tiştek..."**

Ê li nik wî rûniştî got: **"Na lo, DEP'van bi kêrî tiştekî nayên, ji sibehê heta êvarê li vir rûniştine, wê çi bikin."**

Dîsa li eynî derê, şeva ku emê biçin cenazeyê Mehmet Sîncar, polîsan dor li me girt, nehîştin em biçin. Em heya serê sibehê di avahiyê de man, avahî hatibû dorpêçkirin. Şeva me, bi stran, galegal û henekan derbas bû.

Mirovek hîn nû ji Kurdistanê hatibû, me jê pirsî: **"Kurdistan çawa ye?"** Got: **"Lawo wê çawa be, wek dibêjin "sibehê kulahlî, bi şev sîlahlî."** (bi roj bi kullah bi şev bi sîlah) Piştî demekê rabû, di paceyê re li polîsan nihêrî, bi hêrs wiha got: **"Ê lawo, ew ji me çi dixwazin?! Lê sûcê min e, hema berî ez werim, min du keleş di kadînê de veşartin. Bê tu çima yekê bi xwe re naynî. Heke niha keleşek hebûya, min dê lê girê bida, we bidîta ku çawa ji hev bela wela dibin."**

Yekî din li wî vegerand: **"Ma lawo qey DEP heye, mala DEP'ê xera bibe, ne keleşek, ne roketek... Heke niha êrîşê bînin ser me, wê me qir bikin."**

***Gernas Balinde***

# Qanûn

Serran ra ver yew Kurdê ma wo Dimilî û yew dewijê xwi tay sebebandê 'eşîrtey verra têvemanê, yanî danê pêro. Kurdê ma wo Dimilî, dano piro enê dewijê xwi kişeno. Beno qatil. Kurdê ma wo Dimilî mahkum beno, şew roj koyan serra gêreno. Xwi nêdano hukumatê tirkan dest. Rojê cenî û gedê jê kuwenê jê vîrî. Keno seredê xwi ki rojê nêmê şew şoro dewda xwi, qando ki cenî û gedanê xwi ziyaret biko..

Welhasil qerarê xwi dano ku şoro dewda xwi, Kurdê ma koyan serra xwi verdano war, ki xwi nizdiyê dewda xwi kerd, yew cado xewle di xwi letêneno, paweno ki dinya tarî bo. ki dinya bî tarî, Kurdê ma hêdîka cadê xwi ra wardeno şono kêdê xwi. Ki berdê kêdê xwi heti resa, dano berî (kêber) ro. Ceniya jê senî ki vengê berî eşnawena, şona berî ver ki ber ako, vana:

– Kamo? Kurdê ma vano:

– Ber aki, ez za. Ceniya jê derê ber akena. Kurdê ma şono zere. Ceniya jê tira vana:

– Mêrdek, qanûn to gêreno. Vizêr zeftiyan vist kêdê ma ser. To persay, Kurdê ma zano zeftî çiyê. Lakim nêzano qanûn çiyo. Belawo ki Kurdê ma tek qali Tirkî nêzano. Vano qay hela qanûn çi yo. Welhasil Kurdê ma ranaya şew keye ra vejiyeno raşt ver a xwi dano bi koyandê Kurdistanî.

Xeylê wext ra pey, zeftî enê Kurdê ma tepêşenê, gênê benê kenê hepis. Çend hewtey ra pey, enê Kurdî vejenê mahkema. Belawo ki Kurdê ma tek qali Tirkî nêzano, odeciyê mahkema Kurdê ma rê tercumanê keno. Hakim dest bi mahkema keno. Hakim vano, dektîlociyê jê zî şek-teq bi deqtîlo nûseno. Kurdê ma şaş maneno. Ki mahkema qediyay, odecî qerarê mahkema Kurdî rê Tirkî ra tercumanê Kurdî keno. Odecî vano:

– Dato, mahkema ti ceza kerdî. Hewt serî ceza daya to. Kurdê ma odecî ra vano:

– Qanûn mi gêraynê, la ka qanûn? Odecî vano:

– Dato, qanûn mahkemaya. Kurdê ma hiweno, odecî ra vano:

– Yewê vano, yewê şeq-teq nûseno, enkay qanûn enyabi. Odecî ra vano:

– E Dato. Qanûn enya bi. Kurdê ma hiweno, odecî ra vano:

– Mi di marda jîni û qanûndê jîni nawo. Mi zî vatê qay hela qanûnê çiyo.

***Mihem Himbêlij***

*Di meha dawî de bi zêdebûna êrîş û cînayetên kontra û cerdevanan, hilweşandina gund û tehdîtkirina berendamên welatparêz re li Kurdistanê jiyan dijwartir dibe.*

# Şertên hilbijartinê ji holê radibin

**Zana Farqînî**

Têkoşîna di navbera DEP'ê û dewletê de ya li ser hilbijartinên 27'ê Adarê sortir dibe. Piştî ku Partiya Demokrasiyê daxuyaniya "di her şertî de qerarê beşdarbûna hilbijartinê" ya belediyan da, bi ser ve çûna dewletê li gel û DEP'vanan zêde bû, agirê vê têkoşînê hin bêhtir gurr bû û ber bi esman ve hilkişiya.

Îtîfaka ya DEP'ê bi hindikahiyên li Enedolê dijîn re wek **Çerkez, Laz, Abhaza** û yên din, tirs û endîşeyên rejîma kemalîst bêqedar kir. Ku DEP berendamên xwe yên ji bo serokatiyên belediyan li Tirkiyeyê jî kifş kir, ku di nav wan de kesên ji hindikahiyan (mînorîte) di rêza pêşîn de cih digirin, salix ji rewşa acizbûn û xemên dewletê re, nayê dayîn.

Sawa hilbijartinan, ji dema ku ketiye rojeva Tirkiyeyê, kiriye ku ta bi serwerên wan bigire û heta serleşkeriyê daxuyandibû ku divê li Kurdistanê hemû partiyên sîstemê bi îtîfakî têkevine hilbijartinê. **Demîrel** jî diyar kiribû ku talûkeya nirxandina hilbijartinê wek referandûmê li pêşiya wan e û rê nadin kesên nêzîkê PKK'ê. Heta piştî hilbijartinê ew kesên ku bi ser ketibin jî nikarin xwe wek zilamên PKK'ê bidine nîşan, gotibû.

Rojnameya me di hejmara xwe ya **99.** de bi manşeta **"Di hilbijartinên Adarê de li Kurdistanê Hedefa Dewletê DEP e!"** rewşa hilbijartinê radixiste ber çavan. Di hejmara 100 û 101. de jî me balê kişandibû ser **"Qedera hilbijartinê li Kurdistanê ye"** û **"Zehfê hilbijêrên DEP'ê neqeydkirî ne."** Bi her sê hejmarên li dû hev, me bi rayedar, rêvebir, mebûsên DEP'ê re hevpeyvîn çêkiribû û ji aliyê din ve em bi gel re jî ketibûn têkiliyê.

#### BERGEHA LIVBAZIYÊN KONTRAYÎ FIREH DIBE

Di van rojên dawîn de qewmîn û daxuyaniyên rayedarên Partiya Demokrasiyê, nûçeyên ku me amade kiribûn dirastînin (teyîd dikin).

Îtîfaka bi hindikahiyên re, geşt û gerên li Ewrûpayê ji bo ku lijneyên wan bêne nêrevaniyê li hilbijartinan bikin, daxuyaniyên wan î ku didine diyarkirin tevî Kurdistanê wê %10 zêdetir ray bistînin, germahiya tayê li gewdeyên rayedarên dewleta Tirk zêde kir. Êdî livbaziyên kontrayî li nav paytexta Komara Atatürk li dijî DEP'ê pêk tên. Li Enqerê rêxistinên DEP'ê **Yenîmahale** û **Mamak**, hatin bombekirin. Di 5.2.1994'an de saet di 12'ê şevê de **Sekreterê Giştî Murat Bozlak** di mala xwe de ji aliyê kesên "nediyar" ve hate gulekirin, Bozlak bi birîndarî ji livbaziyê filitî.

Livbaziyên "kiryar nediyar" êdî ne bi tenê li **Amedê, Botanê, Xerzan** û herêma **Serhed** û **Çukurovayê**, li **Enqereyê** jî li hemberî kesên xuyanî, demokrat, pêşverû, welatparêz... tê kirin.

•

#### ÎSAL AŞTIYA SPÎ NEHAT

Li Kurdistanê nêzîkbûna meha Adarê bi xwe re ji bo dewleta Tirk tengasiyekê tîne. Lewre tê zanîn ku di Adarê de hem **Newroz** û hem jî hilbijartin heye. Komara Tirkiyeyê hemû xebat û lebata xwe li ser heta biharê "qelandina PKK'ê" dike. Ji **General Doğan Güreş** ta bi **Madam Tansu Çiller** ev "biryardarbûna xwe" bi hevoka **"ya wê biqede ya wê biqede"** diyar kiribûn. Lê ev tişt jî xweş diyar e ku zivistanê jî, ji bo dewletê bi xwe re **"aştiya spî"** neanî û li gorî salên din, di vê werzeyê (demsalê) de livbaziyên gerîlayên PKK'ê bêhtir in.

Valakirin û şewitandina gundan, binçavkirin, kuştin û koçberkirina mirovan, bombekirina rêxistinên DEP'ê, gefllêxwarina dewletê ya li ser gel, rayedar û serokên rêxistinên DEP'ê, guherîna Qanûnê Hilbijartinê, li hin deveran navendîkirina sandoqên hilbijartinê, ray avêtina hêzên dewletê tevî çek û kincên xwe yên fermî û hwd. hemû ji bo berevajîkirina encama (netîceya) hilbijartinê ye. Armanca wan li herêmê qels û jarkirina DEP'ê ye, daxwaza biçûkkirina partiyê ye li hemberî raya giştî ya dinyayê.

#### ÇALAKIYÊN JI BO BEREVAJÎKIRINA ENCAMÊ

Ji bo guherîna encama hilbijartinê li Kurdistanê, ne bi tenê mirovên xwedî mafên rayavêtinê ku bi awayekî zanebûn navên wan di lîsteya hilbijêran de nehatiye nivîsîn û kitm in, koçberkirin jî her di rojeva dewletê de ye. Sê caran li ser hev bombekirina Cizîrê û terora cerdevanan ji bo vê rewşê mînakeke herî berbiçav e. Dema mirov li lîsteya berendamên partiyê, pergala (sîstema) kemalîst çav bigerîne, dibîne ku an cerdevan in, an serokcerdevan in, an jî kesên ku ji ber sûcên adî hatine mehkemekirin û sicîlên wan nepaqij in. Di nav berendamên **Partiya Refahê** ya **Necmettin Erbakan** û ya **Alpaslan Türkeş** (MHP) de, kesên ku rewşa wan ev e, pirr in.

Li herêmê RP (Partiya Refahê) bi Hizbulah re têkilî datîne û bi wan re radibe û rûdinê. Pirsên li ser vê yekê jî, ji aliyê serokê wê yê giştî Erbakan ve nayên bersivandin.

#### LI KURDISTANÊ BERENDAMÊN PARTIYAN

**Fahrî Çeliker:** Sêrt, ji sûcê ku tecawuzî zarokekî kiriye hatiye mehkemekirin.

**Salih Gök:** Batman, bi nêzîkbûna xwe ya bi Hizbulahê ve tê nasîn. Kurê wî **Kutbettin Gök** wek kujyarê **Uğur Mumcu** (nivîskar- rojnamevan) hate girtin, pişt re hate berdan. Her wiha li **Amed û Farqînê** jî berendamên wan ji aliyê gel ve qet nayên hezkirin û wek pêgirê dewletê tên zanîn.

Li Kurdistanê berendamên MHP'ê bi giştî ji cerdevanan in. Berendamê Diha Sêrtê yê MHP'ê, **Serokcerdevan Ahmet Keskîn** e. Navê wî di jin revandinê, îşgalkirina zevî, mêr birîndarkirinê de derbas dibe. Tê gotin ku telîma kontrgerîlatiyê jî dîtiye. Yê **Hêskîfa Batmanê Şerîf Yağmur** jî serokcerdevan e, bi xedariya xwe û mêrkuştinê ve tê nasîn.

Berendamên **DYP û ANAP**'ê jî, ji yên din ne cihêtir in. Ew jî cerdevan û eşîrên ku pêgirê dewletê ne. Li **Cizîrê Serokcerdevan Kamîl Atak**, ji bo ku bê hilbijartin, hemû tehde li gel tê kirin.

Nûçeyên ku ji Kurdistanê digihe me û agahiyên me bi dest xistiye, gel ji hilbijartinê bêhêvî ye, ji ber ku dixuye wê bi awayekî serbest neyê kirin. Fikarê wan ji dewletê heye. Hêzên dewletê ji bo ku gel rayên xwe nedine DEP'ê, gef li wan dixwin. Ji bo mînak li **Mereşê** li **Serokê DEP'ê Alî Gökot**, li **Dîgorê** jî dîsa **Serokê DEP'ê Mehmet Yardimciel** dadixuyînin ku, di bin çav de li wan îşkence hatiye kirin û gef li wan xwarine ku ji serokatiyê vekişin. Li gundan, hêzên dewletê jî propagandeya ku gel rayên xwe nedine DEP'ê dikin, heke na we gundên wan bişewitînin, xaniyên wan bi ser wan de hilweşînin.

#### DI ROJEVA DE'PÊ DE VEKIŞÎN

Serokê Giştî yê DEP'ê Hatip Dîcle li Îzmîrê dema ku berendamên xwe yên navend û navçeyên wê, diyar kir ku hilbijartina li herêmê DEP nekevê tu partî nikarin bikevê. Dîcle di axaftina xwe ya 2.2.1994'an de wiha dibêje: **"Heke pêkutiyên li ser me zêde bibin emê nekevin hilbijartinê. Em ji mirinê re jî hene. Heke em ji ber pêkutiyan ji hilbijartinê vekişin, wê qiyamet biqete. Em naxwazin vê yekê jî bifikirin. Bila me zêde li zorê qirase nekin."** Bi vî awayî nerazîbûna xwe ya ji rewşê diyar dike.

**Parlamenterê Amedê Sedat Yurtdaş** jî, helwesta xwe ya li ser Qanûnê Hilbijartinê ya nû bi vê gotinê dadixuyîne ku "Ev operasyoneke hilbijartinê" ye.

Dewlet li Kurdistanê ji bo ku di hilbijartinan de têk neçe, ne bi tenê bi ser Partiya Demokrasiyê û endamên wan ve diçe, li wan tehde û xedrê dike, her wiha bi ser temamî ronakbîr, rêber, pêşverû, demokrat, welatparêz û hwd. ve diçe. Herêm ji van kesan tê valakirin. Xwestin ev e ku gel bêserî bimîne. Lewre dewlet ne bi DEP'ê sazî û dezgehên din re têdikoşe, raste rast PKK'ê ji xwe re kiriye hedef û her tiştî dide ber xwe. Êdî çi bikeve pêşiyê. Ji bo ku her tişt ji dewletê re wek PKK, pêgir û piştgirên wê dixuyên.

Ji aliyê din ve serlêdan û hewlên DEP'ê encamên xwe didine nîşan. Daxwaziyên wan î ji rêxistin, sazî û sazgehên navneteweyî ji bo nerêvaniyê di cejna **Newroz û hilbijartinên Adarê** de, ji aliyê **Konseya Ewrûpayê** û **Parlamentoya Ewrûpayê** ve hatin qebûlkirin.

Di gel hemû tiştên ku li jor hatin gotin, welê dixuye ku tu ewletî ji hilbijartinan re tune. Hemd û vîna gel bi awayekî azad xwe di sandoqê de wê nede der. Fên û dekên ku ji dewletê kirina wan dihatin hêvîkirin û bendewarkirin, îro li herêmê diqewimin. Pirezeyên hêzên leşkerî û daxuyaniyên serokên partiyan, tevî rayedarên hikûmeta koalîsyonê, li ber çavan in.

#### ŞERTÊ HILBIJARTINEKE DEMOKRATÎK NAMÎNIN

Di van şert û mercan de kirina hilbijartinan ji aliyê gelê herêmê ve ne rast tê dîtin. Lewre dewlet li gorî xwe hemû tedbîr û rêlibergirtinan standiye. Zilamên xwe di partiyên ji hev cihê de wek berendam daye nîşan û hilbijartina wan jî, ji gel dixwaze. Deverên ku DEP lê xurt e ji bo ku denge (hevkêşe) ya rayan biteribîne, dewlet gel mecbûrî koçkirinê dike. Ji bo herêmê, guherîn di Qanûnê Hilbijartinê de çêdike, dixwaze sandoqan bi helîkopteran ji cihê hilbijartinê bibe cihê navendî, ji bo jimartinê. Ev yek jî li dijî rewşa **"bi veşarî ray avêtin û bi eşkerehî jimartin"** e.

Di dawiyê de em dikarin bibêjin ku li Kurdistanê mercên hilbijartineke demokratîk nemaye. Jixwe daxuyana Serokê Giştî yê PKK'ê vê yekê rast derdixîne. Di hevpeyvîna xwe de, ya bi nûçevanê Kurd-A'yê re ku di Gündemê roja 10.2.1994'an de derketiye wiha dibêje: **"Dewlet ji bo ya man, ya jî nemanê têdikoşe."** Di vir de hêjayî gotinê ye ku, bûyîn an jî nebûna hilbijartinan bi PKK'ê ve girêdahî ye. Her kes li bendê ye. Di rojên pêşiya me de rewşa "ewirbûn" an jî "sahîbûn" a dinyayê wê zelal bibe.




*Cerdevan êdî wezîfeya polîs û jendermeyan pêk tînin, riyan digirin, nasnameyan kontrol dikin. Ji bo vê yekê re cerdevanên Eşîra Bucakan herî berbiçav e.*

*Sekreterê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:*

# 'Dewletê Cantürk û Înciler tesfiye kir'

■ Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan piştî demeke dirêj ji nûçevanê KurdA'yê re daxuyaniyên girîng kir. Öcalan li ser qewmînên leşkerî û siyasî yên mehên dawîn rawestiya û daxuyand ku dewletê Behcet Cantürk û Încî Baba kuştiye. Li ser hilbijartinên 27'ê Adarê dibêje ku dewlet "zemînên legal tasfiye dike" û "ya man ya jî nemanê" daye ber xwe.



*Abdullah Öcalan: "Dewleta Tirk her diçe ji hev dikeve"*

**Navenda Nûçeyan–** Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, li ser bûyerên mehên dawîn'ên siyasî û leşkerî ji nûçevenê Kurd–A'yê Hüseyîn Gül re axivî û pirsên wî bersivand, li ser xalên girîng rawestiya û daxuyaniyên balkêş kir. Öcalan di hevpeyvînê de diyar dike ku dewleta Tirk Behcet Cantürk û Încî Baba kuştiye. Serokê PKK'ê wiha dibêje: "Ji van cinayetên dawîn ta bi kuştina mebûsê DEP'ê Mehmet Sîncar û karsezên Kurd ên ku em wan dikarin wek kesên welatparêz binirxînin, raste rast bi qerarê kesên raser hatine pêkhatin. Nabî Încîler ku bi tebîra Încî Baba tê binavkirin û Behcet Cantürk, bi îhtîmaleke mezin ji ber ku di demên berê de di meseleya Kurdî de roleke mezin lîstibûn û di pêşî de jî wek ku wê bilîstina, hatin tesfiyekirin." Öcalan bi berdewamî diyar dike ku bi kuştina van kesan re dewletê xwestiye rê li ber hevkar û pêgirên xwe yên Kurd veke.

Di bersiva xwe ya li ser pirsa der barê hilbijartinê de jî Öcalan wiha dibêje: "Dewlet ji bo "ya man ya jî nemanê " têdikoşe. Bi qaîdeyek "ya wê biqede, ya wê biqede" dixwazin çalakiyên hilbijartinê bimeşînin. Li gorî xwe rewşa îhtîmalî ya referandûmê li Kurdistanê ku derkeve, berevajî bike. Wisa dixuye ku wê hin bêhtir ev polîtîkayên xwe berfirehtir bikin û bimeşînin."

Öcalan li ser operasyona dewleta Tirk a li ser Kampa Zelê jî radiweste û diyar dike ku, dewlet qet nebe xwestiye "biryardarbûna xwe ya siyasî" bide nîşan. Serokê PKK'ê Öcalan sala 1994'an jî, ji aliyê xwe û dewleta Tirk ve hildide dest û wiha dinirxîne :"Bi ya min artêşeke ku di 1993'yan de rewşa têkçûnê dijiya, ne mumkûn e ku di sala 1994'an de xwedî îdîa be. Heke em nekevine tengasiyeke wê mutleqa paşveçûnekê bijî. Mutebaqata li cem burjuvazî jî êdî nemaye, ji vê mezintir jî nikarin mutebeqateke din ava bikin. Jihevketin bi awayekî ciddî dest pê kiriye û wê bileze jî

Di dîplomasiyê de jî encameke zêde nikarin bi dest bixînin. Nexwe ji şerê taybetî ve sala 1994'an wê ne baş be, lê ji şerê me yê şoreşger re wê bibe saleke şadî.

Ku PKK'ê ji xwe re wek muhatabek bibînin tengasiyek e, ne bînin tengasiyek e. Mesele kûr dibe û şoreş jî bi pêş ve diçe.

Kemalîstan, bela ku siyaseta Özal ji xwe re pirr bi talûke dîtin wî bi mirinê, bi awayekî tûj ceza kirin. Dîsa gelek endamên şerê taybetî tesfiye kirin. Wisa kirin ku partî di bin navê " mutabaqeta millî" de nikaribin siyasetê bikin. Gelek cinayetan pêk tînin. Ji bo ku dengekî cihêreng dernekevin, ev kirin.

Hêza me ya gerîla perçîqandina wê li vir bimîne, wisa tê fêmkirin ku we zêdetir bibin. Livbaziyên sala 1993' yan û beşdariya gerîla li tu salên berê nayê muqayesekirin ku mewzî ketine destê gerîla û şansê qezençkirinê derxistine rastê."

## NÊRÎNEK

**Îbrahîm Xort**

### Koçberî

Koç; ji cihekî malbarkirin û derbasbûna cihekî dinê ye. Gava em li jiyana mirovan dinêrin, pirr sedemên koçberiyê hene. Jiyana mirovan pêşî bi koçberiyê dimeşiya. Ev koçberî, tiştekî xwezayî bû. Ji ber ku mirovan hîna dest bi hilberiyê nekiribûn. Jixwe hilberî ku tune be, mirov wê jiyana xwe bi tiştên ku di xwezayê (tebîatê) de hazir be, bidomîne. Belê mirov di dîrokê de tê rewşeke wilo ku jiyana xwe nema kare bi tiştên di xwezayê de hazire bidomîne. Wê gavê mirov mecbûr dimîne ku, hilberiyê bike. Gava ku hilberiyê jî dike (ew cihê ku lê hilberiyê dike) ji wî/wan re dibe welat. Piştî ku cih li ser axekê tê girtin û pê ve jî, ji ber hin sedeman koçberî dîsan mecbûrî çêdibe. Yek ji van sedeman ziwahiya axê ye ku mirov ji tîna û ji birçînan koç dike, yek jê jî, ji ber şeran e. Herdu sedem jî ne xwesteka mirovan e.

Li welatê me jî, îro koçek heye. Gava ku em li herdu sedemên girîng ê koçê dinêrin, ev koç ne ji tîna û ne ji birçîbûnê, ji ber şer e. Sedemê koçê çi dibe bila bibe, bêçaretî ye.

Ma em îro bêçare ne? Em bi ku ve diçin û bi ku ve bar dikin? Ev çûna me çare ye? Ev çûna me wê karibe me xelas bike?! Koçberiya me Kurdan, di dîrokê de qet kevn nebûye, di her demê de boxçika me li ser milên me û me berê xwe daye welatên xerîbiyê. Geh ev koçberiya me bi dû hin serhildanan û geh bi dû hin şerê birakujiyê ve çêbûne. Lê qet me nexwestiye ku em welatê xwe terk bikin, em dane terkkirin! Em bi çol û çiyan ve terqiyane!

Di nava dîroka koçên Kurdan de, mirov dikare hebekî xwe bixapîne, bibêje, em bêçare bûn. Weke piştî serhildana Şêx Seîd, Seyid Rizo, Serhildana Palo û hwd. Lê îro em nikarin xwe bixapînin! Ji ber ku em ne bêçare ne. Ji ber ku em ne bêxwedî ne û ji ber ku em ne bêpêşeng in. Em îro ne bêçare (çar rê!), xwedî çar rê ne!.. Her tişt berevajî bûye li welatê me. Bê çawa di nava dîrokê de pirrî caran em bêçare mabûn, îro neyar bêçare maye. Tiştê ku li me tê xwestin, weke singa ku di axê de çikandî be, em jî, li gund û bajarên xwe, çonga xwe bidin erdê, welatê xwe neterikînin.

Li welatê ku şer lê hebe, koçberî tu caran nebûye çare û nabe çare. Ji bo ku em vê koçberiya xwe biqedînin, divê em li şerê neteweyî hîn bêhtir xwedî derkevin, da ku ev koçberiya me biqede. An jî her dem emê koçer bin.

Dewlet, îro bi hemû hêza xwe, ji bo ku vê koçberiya me zêde bike, dixebite. Yek armanca vê xebata wan heye; Ji hev qetandina gel û gerîla ye. Dewlet vê baş dizane ku gelê Kurd bi xwe gerîla ye. Û gerîla bi xwe gel e. Dewlet dixwaze ku pêşiyê gund û mezrayan vala bike, çima ku gund û mezra, çavkaniya gerîla ne. Li van deveran bi gerîla nikare, bi gel dadikeve. Dixwaze gel, ber bi bajaran ve, ber bi metropolên Tirkan ve koç bike, ku hem gel û gerîla bêxwedî bimînin û hem van koçeran asîmile bikin. Û Kurdan ji dîrokê paqij bikin. Wê gavê yek havila me dimîne, dewlet çiqasî êrîşî me bike, divê em jî, hîn zêdetir bersivê bidinê, ku em bikaribin bi ser kevin. Ji bo ku em bikaribin vê bikin jî, divê em tu carî çavtirsandî nebin û weke neviyê Rostemê Zal, weke rêhevalê Egît û Mazlûm, di nava vî şerê bi rûmet cihê xwe bigirin.

## Bi hejmaran binpêkirina mafê mirovan di 1993'yan de

Li gorî rapora KMM'ê(IHD) sala 1993'yan bû, sala binpêkirana mafê mirovan. Em ji hinek reqemên di wê raporê de pêşkêşî xwendevanên xwe dikin:

**Gundên ku bi darê zorê ve hatine vala kirin:** 874
**Kuştina bêdarazî:** 135
**Kesên ku di binçav de windabûne:** 29
**Rojnamevanên ku hatine kuştin:** 6
**Belavkarên ku hatine kuştin:** 8
**Cinayatên kiryar nediyar:** 510
**Rojnamegerên ku hatine girtin:** 51
**Partiyên ku hatine girtin:** 4
**Komeleyên hatine girtin:** 48
**Pirtûkên qedexebûyî:** 33
**Rojnameyên berhevkirî:** 260 hejmar
Ji bo van 231 sal hepis û 21.000 milyar cezayê pere hatiye birrîn.

## ERNK'ê qedexeya li ser perwerdehiyê hilda

**Navenda Nûçeyan–** ERNK'ê bi belavokekê qedexeya li ser perwerdehiyê (terbiyeyê) rakir. Komîteya Eyaleta Amedê ya ERNK'ê ev biryar di 5'ê mehê de li navenda Amedê bi riya belavokê ragihand û daxuyand ku ji 6'ê Reşemiyê bi şûn ve qedexî hatiye rabûn û livbazî gihiyaye armanca xwe.

Di belavokê de tê diyarkirin ku ji ber taybetiya perwerdehiya kemalîst di 27'ê Sermawezê ya 1993'yan de biryareke wisa standine. Dîsa tê daxuyandin ku dibistanê kemalîst cihê asîmilasyona zarokên Kurd in û daxwaza wan ne ew bûye ku rê li pêşiya pêvajoya (perwedehiya) ciwanan û azadiya xwendina wan bigirin. Ji aliyê din ve li ser cinayetan tê rawestin ku dibistan di wan qewmîn û bûyeran de wek navendeke kontrayan hatiye bikaranîn û armanca wan ew bûye ku, bûyerên ji ber wê rewşê çêbûne bidine rawestandin. Komîteya Eyaleta Amedê ya ERNK'ê li ser sebebê hildana qedexeyê jî wiha disekine: "Ev biryara me gihiya armanca xwe. Dewlet dibistanan dike şûna hêlîna kontrayan. Dikin ku mirovên me li hemberî gelê xwe sûc bikin. Divê gelê me li ser vê yekê pirr şiyar be."

# Rastnivîsa lêkerên hevedudanî (2)

■ Di normalê de li gora mantiqê van lêkeran diviya "tê" ji dêvla daçek û cînavekê (di+wî/wêyekî/tiştekî) kar bikira. Lê belê di hevoka pêşîn de daçekeke din , (ji) heye û her wiha ji ber ku berkirde hatiye diyarkirin (peyvên te), cînav ne hewce ye? Lêkera "têkoşîn" berkirde (obje) nasitîne û gava ku berkirde hebe, lêkereke din, têkoşîna tiştekî kirin an jî ji bo tiştekî têkoşîn kirin, tê bikaranîn. Di her du lêkeran de jî, tê wek di wî/wê ji hev venabe. Wê gavê tu fonksiyona serbixwe ya "tê" namîne û tenê wek pêşpirtikekê kar dike. Ji lewre mirov dikare bi hêmana lêkerî re binivîse.

**Baran Rizgar**

Çend hevokên ku van lêkeran dihundirînin li jêr in:

**Qopiyekê ji wê bigire/ Qopiyekê jê bigire.**

**Ev kar ji wî nayê/ Ev kar jê nayê.**

**Gelek diravê min li wî ye/ Gelek diravê min lê ye.**

**Ma pitik li bavê xwe çûye/ Na weleh, qet lê neçûye.**

**Tu li wê geriya?/ Erê, ez lê geriyam, lê min nedît.**

**Ev gomlek li Şoreşê nayê. Ewê ha lê tê.**

**Divê em li vê babetê pir bikolin. Berê qet lê nehatiye kolan.**

**Ez bi dengê derî nehesiyam. Lê Zîn pê hesiyabû.**

**Ez bi wî nikarim. Ma kî pê kare?**

Lê belê ji van lêkeran hin her car, wek ku me di her sê xalên jorîn de got, naşuxilin. Ango di vê koma lêkerên hevedudanî de hin îstîsna hene:

**a)** Hin kurte carinan fonksiyona pêşpirtika "bi" dibînin.

**b)** Di hin lêkeran de hêmana nelêkerî fonksiyona xwe ya daçek û cînavkbûnê wenda kiriye.

**c)** Di hin lêkeran de hêmana nelêkerî û ya lêkerî pev keliyane, ango hêmana nelêkerî teşe naguherîne.

Ji îstîsnaya ku me di xala **a)** de nivîsî qaîdeyek dernakeve. Ji ber ku ew ne hevgirtî ye. Carinan ketina **bi-** li gor devokan e. Ango di hinan de dibe, di hinan de nabe. Carinan jî eynî lêker di wateyekê de **bi-** dixe, lê belê di wateyeke din de naxe. Wek: **Gomlek ji wî/jê bike. Pelekî jêke** (jê bike), hwd. Ji lew re em dikarin di babeta pevre an cihê nivîsînê de xala **a)** notir bihêlin, lê belê xalên **b)** û **c)** girîng in. Ji ber ku ew hem bi fonksiyonê û hem jî bi teşe guherandinê ve girêdayî ne. Ji lew re, em dikarin bibêjin ku hek hêmana nelêkerî **(jê, lê, pê, tê)** fonksiyona xwe ya daçek û cînavbûnê wenda kiribe û hek bi lêkerê ve keliyabe ango teşeyê xwe neguherîne, divê cihê neyê nivîsîn; bi hêman lêkerî ve bê nivîsîn.

Lê li jêr emê ji van lêkaren li yên herî belav bikolin:

**Têgihîştin, têkoşîn: Tê**, êdî wek daçek+cînavk kar nake û gava ku fonksiyona cînavkî ji ser diçe, teşe naguherîne:

**Heke ez ji peyvên te tiştekî têbigihîjim.**

**Emê ji bo welatê xwe têbikoşin.**

Di normalê de li gorî mantiqê van lêkeran diviya **"tê"** ji dêvla daçek û cînavekê **(di+wî/wê/yekî/tiştekî)** kar bikira. Lê belê di hevoka pêşîn de daçekeke din, **(ji)** heye û her wiha ji ber ku berkirde hatiye diyarkirin **(peyvên te)**, cînavk ne hewce ye? Lêkera **"têkoşîn"** berkirde (obje) nastîne û gava ku berkirde hebe, lêkereke din, **têkoşîna tiştekî kirin** an jî, **ji bo tiştekî têkoşîn kirin,** tê bikaranîn. Di her du lêkeran de jî, **tê** wek di **wî/wê** ji hev venabe. Wê gavê tu fonksiyona serbixwe ya **"tê"** namîne û tenê wek pêşpirtikekê kar dike. Ji lew re mirov dikare bi hêmana lêkerî re binivîse.

**Jê kirin, lê dan, lê ketin, lê kirin, lê xistin, pê ketin, pê xistin, tê kirin, tê xistin**

**jê kirin:** Kincan ji pitikê bike/ Kincan jê bike/jê ke/ hinarekî jê ke (jê bike)/hinarekê ji darê bike

**lê dan:** Kê li wê daye/kê lê daye?

**lê ketin:** Ewê li serê wî keve/ew ê lê keve.

**lê kirin:** We çi nav li wî kir/We çi nav lê kir? Me av li wir nekir/Me av lê nekir. Min bar li kerê kir. Min bar lê kir.

Lê belê:

Min navê xwe li kaxezê lêkir (nivîsî).

Me xaniyek lêkir (ava kir).

Di van her du maneyên jorîn ên lêkirinê de, **lê** fonksiyona xwe ya daçek+ cînavkbûnê wenda kiriye. Ew tucarî wek **li wî/wê** venabe. Ji lew re divê bi hêmana lêkerî re were nivîsîn.

**Lê xistin:** Hûn çima li wî rebenî dixin/ Hûn çima lê dixin? Ka ji me re bîskekê li gîtarê bixe/Ka bîskekê lê bixe. Ew her tim li armancê dixe/Ew her tim lê dixe.

**Pê ketin:** agir bi tene ket/Agir pê ket. Ew bi bapêşê ket/Ew kengî pê ket?

**Pê xistin:** Te ez bi bapêşê xistim/Te ez pê xistim. Kê agir bi tene xist/Kê agir pê xist?

**Têkirin, têxistin:** Ev her du lêker dikarin bi du awayan werin bikarinîn.

Pênûsê di çente bixe/ Pênûsê têxe çente.

Pênûsê di çenteyê xwe bike/ Pênûsê têke çentyê xwe.

Di awayê duduyan de, ji ber ku nav piştî lêkerê **tê**, êdî daçek ne hewce ye. Ango fonksiyona tê ya daçek+cînavkbûnê nemaye. Ji lew re ne pêwist e ku mirov wê cihê binivîse. Jixwe tiştekî din î taybetî heye. Di van her du lêkeran de, hêmanên lêkerî jî dikarin bi navê piştî xwe ve bikelin û wî wek cînavk vehewînin:

**Pênûsê têkê.**

**Pênûsê têxê.**

**Pênûsê têke çente.**

**Pênûsê têxe çente.**

**2.A.b**

Hêmana nelêkerî dikare kurteya **bi û hev, bi û yek** (êk), **di û hev, di û yek** (êk) be. Kurteyên wan li jêr in. Ji ber ku daçek û cînavk fonksiyona xwe diparêzin, divê cihê bên nivîsîn. Jixwe ew pirr caran ji hev vediqetin û veqetin an pevkelîn, ne wate ne jî fonksiyonê diguherîne.

**pev= bi hev:** Pev çûn, pev ketin, pev xistin

**pêk= bi yek/êk:** pêk anîn, pêk hatin

**Tev= di hev:** Tev dan, tev gerîn

**Têk= di yek/êk:** Têk birin, têk çûn, têk dan

**Çend hevokên bi van lêkeran:**

**Zarokên me pir pev diçin.**

**Lêkerên hevedudanî ji pirr hêmanan pêktên.**

**Tev negere!**

**Emê wan têk bibin.**

**Divê îcar em têk neçin.**

### 2. B HÊMANA NELÊKERÎ NAV AN RENDÊREK E

Nav an rengdêra ku hêmana nelêkerî pêk tîne, xwedî fonksiyon û wate ye. Ji lew re hêmana nelêkerî cihê tê nivîsîn.

**Sor bûn, qelew bûn, av dan, bersiv dan, nav dan, derew kirin, henek kirin, xwar kirin**

Ma te çîçek av dan?

Silo pirr nav daye.

Ewê ha pirr derewan dike.

Ew zêde henekan nake.

Bes pê bilîze, te xwar kir.

Ev nav an rengdêr dikarin hevedudanî jî bin:

**bicih bûn, bicî kirin, bikêr hatin, serwext bûn, serwext kirin, serobin bûn**

### 3 LÊKERÊN BIWÊJÎ (PHRASAL VERBSLOCUTIONS VERBALES)

Ji hêmaneke lêkerî û çend hêmanên nelêkerî pêk tên. Ango hêmanên nelêkerî pirrehejmar in. Ji ber ku her hêmaneke nelêkerî wate û fonksiyonek heye, divê hêmanên nelêkerî cihê bên nivîsîn, Yên herî belav û çend hevokên bi wan li jêr in:

**Anîn bîra xwe, bala xwe da, bawerî pêanîn, bi hev ketin, bi hewa ketin, bi ser ketin, bi xew ve çûn, dest pê kirin, dev jê berdan, jê hez kirin, ji bîr (a yekî) birin, ji bîr kirin, li ber xwe ketin, li ber xwe dan, li hev anîn/hatin**

Bala xwe bide mamoste.

Balefir zû de bi hewa ketiye.

Zû an dereng, emê bi ser kevin.

Ez pirr betilîbûm. Çer ku ez rûniştim, ez bi xew ve çûm.

Ka em dest bi karê xwe bikin.

Heta ku deynê xwe nede, em dev jê bernadin.

Ma tu ji wî hez nakî?

Me navê kuçê ji bîr kiribû.

Ew pirr li ber xwe dikeve.

Ma ew xwe bi xwe li hev hatin, an hinan ew li hev anîn?

Di hin lêkerên hevedudanî de hêmana nelêkerî piştî ya lêkerî tê. Di vê rewşê de, hêmana nelêkerî cihê tê nivîsîn. Çend lêkerên belav û çend hevok li jêr in:

**Anîn cih, avêtin, çûn ava, dan dû/pê/pey, ketin dû/pê/pey, ketin xwar, xistin xwar**

Divê tu vê vatiniyê binî cih.

Leşker her ro diavêjin ser gundên me.

Gelo seat di çendan de roj diçe ava?

Em reviyan, lê belê leşkeran dan dû/pey/pê me.

Kî ket dû/pey/pê wan?

Hêdî law! Tu yê zarok bixî xwarê.

Min ji te re negot, pirr baz nede, tu yê bikevî xwar.

Lêkerên hevedudanî dikarin wek navan jî werin bikarinîn. Di normalê de, ji ber ku tu wate û fonksiyona hêmanan a bi tena xwe êdî namîne, û giş bi hev re tên, dikarin wateyekê bidin û fonksiyonekê bibînin, divê giş bi hev re bên nivîsîn:

**Devjêberdan, jêbirin, jêçûn, jêgirtin, lêdan, lêxistin, çêkirin, pevçûn, pêkanîn, pevxistin, pêkanîn, rûniştin, ramûsan, lihevanîn, lihevhatin, serxwebûn, jibîrkirin, hwd.**

Ew giş navên mê, ne li gor wê tên tewandin:

Jêbirin ji jêçûnê baştir e.

Lihevanîna wan pirr dijwar e.

Pêkanîna vê pir hêsan e.

Me ji bo pevpistina wê pirr mesref kir.

Lê belê carinan pêwist dibe ku mirov peyvikekê (nav, cînavk) têxe navbeyna hêmana nelêkerî û ya lêkerî. Wê gavê yên ku peyvik dikevin navbeynê cihê tên nivîsîn:

Zemkirin ne baş e.

Lêxistin ne çare ye.

Devjêberdan pirr dijwar e.

Zema mirov kirin ne baş e.

Li wî xistin ne çare ye.

Dev ji cixarê berdan pirr dijwar e.

Radera (mesdera) lêkeran di raweya tebatî (pasîv/ de wek nav tên bikaranîn. Ji lew re divê hêmanên lêkerên hevedudanî di wê rewşê de pev re bên nivîsîn: **hatin rastkirin, hatin pêkanîn**, hwd.

**Çavkanî:**


Dersên Kurdî, Baran Rizgar, 1993, London

Grammaire Kurde, E. Celadet Bedirxan– Roger Lescot, 1970, Paris

Kürtçe Gramer, Dr. Kamuran Alî Bedirxan, Özgürlük Yolu Yayınları, 1986

Reformek Pêwîst e (IV), Reşo Zîlan, Bergeh, Hejmar:4, 1990, Swêd

*Di biçûkahiya xwe de çavekî wî kêm didît, yê din jî di îşkenceyê de teqandin*

# Hevalê şevê mamosteyê jiyanê

**M. Zahir Kayan**

Mamoste Hidayet dest avête meya xwe û bi kesereke bêmirin lêda, dema ku lêda dîsa xeyalên wî û ramanên wî çûne cihekî din. Bi şevê re peyivî, ji şevê re rewşa welêt bang kir.

Bi zaravayê Dimilkî û devokê "Cebexçûrî" stranek bi navê "Şono" ji me re got. Strana "şono" felsefeya korekî ku hemû evîndariya xwe ji bo welêt ava kiribe, dide xuyan. Ev stran di wan şevên Mamoste Hidayet, yên ku bi bîra welêt derbas dibin de hatiye zimên û afirandineke hunermendî ye. Mamoste Hidayet vê stranê bi meya xwe ya hevalbend dewlemendtir dike û dema ku dibêje, ji xwe dûr dikeve, dizgîna jiyana xwe ya taybetî ji bîr dike, dibe şervanekî li serê çiyan, dibe Evdalê Zeynikê, dibe helbestvanê neteweyê. Ew nabîne, kor e, lê ji yekî dîtî hezar carî xurttir dibîne. Çavê wî nabînin, lê dilê wî, mêjûyê wî, giyana wî rola hezar çavî dibînin. Dilê wî bi kesera welêt dax bûye, ku mêvanek tê malê ew ji nû ve amade dibe, dikeve hin rewşên taybetî. Wisa dizane ku "Hevalek" hat. Bawer dike ku yê ji wî karên welatheziyê bixwazin û ew dikeve nav hinek baweriyên xurttir. Milê wî dibine wek hezar bask û ew ji nû ve difire, lê her car ambûrê wî yên muzîkê li ba wî nin. Zimanê têkoşîna Mamoste Hidayet ev hacet in. Ew ji mêvanê xwe re bi zimanê xwe yê taybetî stranan, kilaman, sirûdan dibêje.

*Heval şono şono şono*
*Hewar şono şono şono*
*Derd welatê ma girano*
*Welatê ma Kurdistano*
*Heval şono şono şono*
*Kewt bindestê neyarano*
*Hewar şono şono şono*
*Wişta partiya karkerano*
*Heval şono şono şono*
*Derd welatê ma girano.*



*Mamoste Hidayet kul û keser û evîna xwe ya ji bo Kurdistanê bi bilûrê tîne ziman.*

### EZ JI BO WELATÊ XWE KOR BÛME

Mebest û ramana xwe wisa tîne zimên. Kor e, lê dibêje "Ez ji bo welatê xwe kor bû me". Tenê ye, lê tu car tenê namîne. Dilê wî her car bi welat re ye. Li serê çiyan e û bi evîndariya gerîla û serokatiyê tije ye.

Dema ku em çûn, me ev rewş li ber çavê xwe dît, dilê me jî tije bû. Her wekî mirovekî wiha welathez ku ji welatê xwe dûr bimîne, jê re çiqas dijwar e, lê na ! Wî zimanê gihîştinê, hevdîtinê ji zû ve kifş kiriye. Di destê wî de çar heb hacetên muzîkê; mey, bilûr, bilûra bi ziman (Ev "bilûra bi ziman" mamoste Hidayet nav lêkiriye, lewre ev bilûr ji aliyê keçika wî ya gerîla ve hatiye diyar kirin) hebûn, bi wan hacetan helwesta têkoşîna xwe xweş dianî ziman. Digot: "Ji bo welêt, ji destê min çi were dikarim bikim, her tiştekî bedelekî wî heye. Ev bedel ku çavê min bin jî, ez dê wan çavan bi dilgeşî feda bikim, tu car ji bo vê rewşê rûsar nabim." Belê mamosteyê hêja ji bo welatê xwe çavên xwe feda kiriye, lê tu car ew negiriyaye, poşman nebûye, hê jî dixwaze ji bo tekoşînê gelek tiştan bike. Her beytên ku dibêje, her stran û kilamên ku ji devê wî derdikevin, giş ji rastiyên welatê bindest in. Ew dibîne. Jana welêt, birîna welêt di axîn û zarîna wî de xwe dide der. Ew mela ye, melayê medreseyên Kurdistanê ye. Der barê mela û melatiya xwe de wî ji me re ev tişt got: "Pêwist e ku mela ji bo gelê bindest û xapiyayî bibin havil, rastiya ol û oldariyê bi wan bidin hesandin."

### WÊ KURDISTAN BI SOSYALÎZMÊ RIZGAR BIBE

Mamoste Hidayet der heqê xwe de van agahiyan dide me. "Bi kurtasî ez di sala 1944'an de li gundê Pêçarê, ku li ser navçeya Liceya Amedê ye ji dayîka xwe bûme. Ev gund di sala 1925'an de di serhildana Şêx Seîd de ji aliyê dewletê ve hatiye rûxandin. Bavê min hê ez 5 salî bûm, ez dame ber xwendinê, min xwendina olî ya medreseyê di 16 salan de qedand. Paşê min li Kurdistanê meletî kir. Bavê min mirovekî welatparêz bû û min li ba wî ilmê Marksîzm û Lenînîzmê hilda. Rihê welatheziya min û baweriya neteweyî, ji bavê min gihîşte min. Ez wisa difikirim ku Îslam û sosyalîzm wek hev in, Kurdistan wê bi sosyalîzmê rizgar bibe"

Dema ku em çûne mala Mamoste Hidayet, me der barê jiyana wî de gelek tiştên berbiçav dîtin. Her wekî li Stenbolê di xaniyê Mizgeftekê de dimîne, dewletê piştî girtina wî meaşa wî bi kêmasî daye û niha di nav hin tengasiyan de maye. Li Kurdistanê bi rola melayekî li her derê ji bo welat û têkoşîna şoreşger, ji destê wî çi hatiye xwe nedaye paş. Lê wî digot: "Min berê hin partiyên başûrê Kurdistan diparastin, dema ku PKK derkete holê me tama têkoşînê bi vê rêxistinê hilda. Min ji herkesî re digot: "Ez bala xwe didime hemû rêxistinan, ji bo welêt kî xebatên hêja bike û riya kîjan partiyê delal be, ezê xwe bi wê partiyê ve girê bidim." Her wekî PKK di nav gelek rêxistinan de ya herî balkêş û bi rûmet bû. Ev zêdeyê neh û deh salan e me xwe bi vê partiyê ve girê daye û ez dizanim ev rêxistin ji bo gelê Kurd pirr girîng e û wê riya rizgariyê li me hemû Kurdan vebike." Mela qala girtina xwe dikir, rûçikên wî tije kîn û hêrs dibûn. Di xaniyê Mizgeftê de, di wî cihê kevin û fireh de ew wek şerekî dihate helanê, tirsê cihê xwe dabû sîtemê, bêbaweriyê cihê xwe dabû hêviyê. Wî digot: "Dewletê êrîş anî ser mala min û hemû kesên li mal bi kotekî hildan birin, li me hemûyan îşkence kirin, bi kîn û nefret li min xistin û bi taybetî li korbûna çavê min geriyan û gihîştin mexsed û mirazê xwe." Mamoste Hidayet niha kor e, di xaniyekî kevin û fireh de dimîne. Ku sibe dibe, ew dest bi jiyaneke nû dike. Ku xwarin û vexwarina xwe dixwe, bi geş radibe li ser mîndera xwe rûdine, keçeke xwe dide teniştа xwe û rojnameya Özgür Gündemê û ronameya Welat pê dide xwendin û guhdarî dike. Keçikên Mamoste Hidayet herdu rojnameyan jî pirr delal dixwînin. Mêvanê wî her car hene û li her derê kes ji bo dîtina wî tên. Ew li hemberî mêvanan xwedîmaliyekî cihêreng e. Bi gelek hunerên xwe û bi welathezî û baweriya xwe û demên xweş bi mêvanan dide derbaskirinê.

> Mamoste Hidayet:
> "Min berê hin partiyên Başûrê Kurdistan diparastin, dema ku PKK derkete holê me tama têkoşînê bi vê rêxistinê hilda. Min ji herkesî re digot: Ez bala xwe didime hemû rêxistinan, ji bo welêt kî xebatên hêja bike û riya kîjan partiyê delal be ezê xwe bi wê partiyê ve girê bidim."

### ZIMANÊ MEY Û BILÛRÊ

Malbata wî rûmeteke mezin ji mamoste Hidayet re digirin û ji Mamoste re dibine çav. Wî digot: "Hunerê min gelek in, ez ji gelek tiştan fêm dikim. Hekîmî, dengbêjî û sazbendiya min wek dîtina min xurt e. Ez hemû keserên xwe û ramanên xwe bi van hunerên xwe dinirxînim." Dema ku Mamoste Hidayet meya xwe û bilûra xwe saz kir, wê demê qetek ji rewşa Kurdistanê hate ber çavên me. Hemû dengbêjên Kurdistanê û hunermendên gelê Kurd yek bi yek di nav peyvên Mamoste re gul vedan û çûn. Ew li ser çokên xwe disekinî, berçavka reş li ser rûçikên wî yên qemer neditebitî. Her meqamê ku ji meya wî û ji bilûra wî der diçû, bi hezar keserên Kurdistanê dihatin xemilandin. Sewta dengbêjan û axaftina helbestvanan ji stranên wî û sirûdên wî diavêt. Dihate ziman: "Min gelek helbest afirandine, lê ez wan helbestan ji bo têkoşîna Kurd û Kurdistanê bi nirx nabînim, carinan wiha yeko yeko dibêjim. Ew dem pîreka Melayê têkoşer bi daxwazî "Ca kilameke ji me re bibêje, ji wan stranên lolo, lêlê.." Mela bi hêrs: "Keçê tu çima wiha dibêjî, ez dizanim wê rojekê Kurdistan rizgar bibe, lê ev stranên ku îro bi dîrûşme tên bikaranîn, wê bimirin û dîsa ji me re wê ev kilamên "lêlê" û "lolo" bimînin. Şaristanî û mînakên çandê ev in." Mela lîteratûra xwe ya stran û kilaman bi sirûdên neteweyî dewlemendtir kiribû, deng û awazên wî wek sewta xortên çarde panzde salî, zîz û wek zengil derdiket. Di nav sirûdên wî de:

Ey Raqîb
Birayê Delal
Şehîd namirin

Lêxe gerîla jî hebûn. Dema ku wî ev sirûd digotin, radibû li ser çokên xwe disekinî û bi malbata xwe ve, bi dengekî xurt bi kar dianî. Di gotina wê de gerîla, çiya û welat bi tewrekî din derbas dibin, bi kesera mirovekî kor dixemilin. Mamoste ji beytên bavê xwe û ji dîwana wî gelek mînakên giranbuha jî pêşkêş kirin. Wisa dixuye ku wî ji bavê xwe û ji civaka ku jê hatiye gelek tişt hildane. Ji dengbêjan, ji hozanan, ji helbesvanan û ji çand û toreyê gelek tişt...

*Hevpeyvîn bi Ehmedê Xanî re*

# Kurdistan bûk e xêlî û qelen xwîna sor e

Jan Dost

**Dilê Xanî eger çi gencexane "spas şukur" qet kes nego: Xanî bi çendan!!**

*Seydayê Xanî hûn di helbesteke xwe de, wisa dibêjin û di destpêka Mem û Zîn'ê de jî we gilî û gazin kirine, gelo ji bo çi?*

– Şaîrên ku doza wan mezin be, helbet wê gilî û gazinan bikin, çunkî yê dorê jê fêm nakin û guh lê nakin. Ê şaîr pêxember e, kûr dibîne, tiştên ne diyar dibîne. Îcar çaxa tê wê nêrîna xwe dibêje, kes jê bawer nake û belkî bibêjin ev dîn bûye... Min bi çavê xwe birîna milet didît, min derman jî nas kiribû. Mixabin, ezê şaîr çi ji destê min dihat? Her tişt di destê begler û mîr û xurdkaran de bû. Ê min bes qelem û kaxezên min hebûn, lewre min ev qêrîn di Mem û Zîn'ê de kir:

**Namûs e li hakim û emîran**
**Tawan çi ye şaîr û feqîran?**

Mîr guh neda min, gotinên min xav û pûç dîtin, min perîşaniya miletê xwe didît. Xwîn vala diherikî, Osmanî ji aliyekî ve, Safawî ji aliyekî û parçebûna milet jî, ji aliyekî ve, bûbûn qefleke gurên birçî. Kurd weke pezekî dabûn ber penc û qîlên xwe yên tûj.

Min çendî kire qêrîn, badihewa bû, ji ber vê min gilî û gazinên xwe gotin.

*Çend salan nivîsandina Mem û Zîn bi we re dirêj kir?*

– Welahî kurê min, baş nayê bîra min, lê ez xweş dizanim ku ev destan tim di bîra min de bû. Heta temenê min bû 40 sal, min dest bi nivîsandina wê kir, tiştê min zanibû min nivîsandin.

*Gelek ji Kurdên niha, ji Mem û Zîn'ê fêm nakin. Ji pirrbûna peyvên Erebî û Farisî, wê ev pirs çawa çareser bibe?*

– Ev ne sûcê min e, ev sûcê we ye. Dema min Mem û Zîn nivîsand tevan jê fêm dikir, niha hûn edebiyata xelkê dixwînin û hûn li berhemên kevin venagerin. Hinekî xwe biwestînin û dev ji sistiya xwe berdin, hûnê bi hêsanî fêm bikin. Çênedibû, wê çaxê ez safî bi Kurmancî binivîsim. Ez mecbûr bûm min peyvên Erebî û Farisî bi kar anîn. Ji wisa pê ve nedibû, niha çend kesê bi xîret hene Mem û Zîn şîrove kirine. Hûn dikarin bi riya wan jê fêm bikin.

*Kê Mem û Zîn şirove kiriye?*

**– Hejarê Mukriyanî û Perwîz Cîhanî** ji rojhilatê başûrê Kurdistanê, **Eminê Osman** ji başûrê Kurdistanê, **Mehmed Emîn Bozarslan** ji bakurê Kurdistanê û niha Jan Dost Mem û Zîn'ê bi Erebî şîrove dike.

*Hûn van xebatên li ser Mem û Zîn'ê çawa dibînin?*

– Ne xerab in, baş in, destên wan sax bin. Ev delîl e ku qêrîna min badihewa neçû, lê bi rastî tu kesî dilê min hîn rehet nekiriye. Gelekan ji Mem û Zîn'ê bi temamî fêm nekirine. Hema M.E. Bozarslan mîsalek e Wî wateya peyva Bêjên wisa daniye: "Bêjên yanî bêjing." Heyran, Bêjen ne bêjing e, ew navê dilgirtiyê Menîje ye. Bila Bozarslan **Şahnama Firdewsî** bixwîne û zû zû wateyên entîqe ji peyvên min re nebîne. Hinek bêhnfirehî divê, li tu xebatên edebî ecele nekin.

*Hûn rojname û kovarên Kurdî dixwînin?*

– Na, tiştek nagihîje destê min, lê ez dizanim çi tê nivîsandin. Ev rojname û kovar divê berê xwe bidin zimanê Kurdî û teşqeleyan çênekin. Her yek bi awayekî dinivîse, ev yek xerab e û ziman paşve dixîne...

*Miletê Kurd hîn negihîştiye armanca xwe di avakirina dewleteke serbixwe de, di nêrîna we de ev xewn wê çawa bibe rastî?*



**Şaîrên ku doza wan mezin be, helbet wê gilî û gazinan bikin, çunkî yê dorê jê fêm nakin û guh lê nakin. Ê şaîr pêxember e, kûr dibîne, tiştên ne diyar dibîne. Îcar çaxa tê wê nêrîna xwe dibêje, kes jê bawer nake û belkî bibêjin ev dîn bûye... Min bi çavê xwe birîna milet didît, min derman jî nas kiribû. Mixabin, ezê şaîr çi ji destê min dihat? Her tişt di destê begler û mîr û xurdkaran de bû. Ê min bes qelem û kaxezên min hebûn, lewre min ev qêrîn di Mem û Zîn'ê de kir: Namûs e li hakim û emîran Tawan çi ye şaîr û feqîran?**

– Min berê di Mem û Zîn'ê de gotiye li ser Kurdan:

**Lew pêk ve hemîşe bêtifaq in**
**Dayim bi temerrud û şiqaq in**

Û min gotiye:

**Her çî bire şûrê destê hîmmet**
**Zebt kir ji xwe re bi mêrî dewlet**

Divê Kurd bibin destek, çawa dijmin li hember me dibin yek û di qirkirina me de bi yekîtî difikirin, em jî divê xwe bidin ser hev û kînê ji nav xwe rakin. "Yekîtî" berî her tiştî, pişt re zor û quwet. Bi rehetî pirsa me çareser nabe. Kurdistan bûk e, xêlî û qelen xwîna sor e. Ev xwîn divê bi zanebûn bê rijandin, her kes dikare xwînê birijîne, lê her kes nikare dewletê bi hêsanî ava bike.

*We di Mem û Zîn'ê de, qala sê helbestvanên Kurd tenê kiriye; Melayê Cizîrî, Eliyê Herîrî û Feqê Teyran. Gelo ji wan pê ve tune bûn û hûn ji kîjanî bêhtir hez dikin?*

– Helbestvan hebûn û min tenê qala wan her sê helbestvanên mezin kiriye. Wan hersiyan riya helbestê di toreya Kurdî de çirandin. Ez pirr ji Cizîrî hez dikim, wî bi zimanekî bilind û xweş û şîrîn helbestên xwe nivîsandine. Evîna wî zehf pak e, xwedayî ye. Helbestên wî mişt muzîkî ne û ez karim bibêjim ji aliyê muzîkê ve Cizîrî, ji **Hafizê Şirazî** derbas bûye. Belê Feqiyê Teyran, ne gelekî xurt e û mixabin gelek tişt li ser navê wî derketine. Ez dixwazim hûn hay ji vê pirsê hebin û her tiştî li ser zimanê wî qebûl nekin. Wek dîwana **Tenbûr.** Heyran ew ne helbestên wî ne, hinekan ji xwe re çêkirine. Ma **Yûsif û Zuleyxa** nexistin stûkê min? Min nenivîsandiye, destanê hinekan çêkiriye. Ez bi xwe ji tiştên wisa re ne vala bûm.

*Niha helbesteke nûjen çêbûye, hinek ji helbestvanan çarçoveya Klasîsîzmê şikandine û helbesta serbest dinivîsin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?*

– Te got çi?! Heyran tu bi çi zimanî diaxivî? Pa welleh min ji te fêm nekir?

*Seydayê min, ev zimanê Kurdî ye, em îro bi kar tînin ezê ji te re wergerînim:*

*Niha şaîrên derketine, guh nadin erûzê û qesîda xwe bêwezin û qafiye dinivîsin? Hûn vê yekê çawa dibînin?*

– Qesîde, şiîr bêyî erûzê nabe. Muzîk muhîm e, ferqa navbera şiîr û nesîr muzîk e, lê xweşiya gotinan pêwist e. Eger gotinê van kesên ku tu ji wan re dibêjî "helbestvanên nûjen" lihevhatî bin û xweş bin xem nake, lê eger gotinê ser tenûran bin û qerwelkên ku tu kes jê fêm neke bin, nenivîsin çêtir e.

Dema me helbest dinivîsandin, her tişt xuya bû. Şiîr şiîr bû û nesîr (pexşan) nesîr bû, lê xuya ye niha her tişt ketiye nava hev, bûye şorbe. Şorbe xweş be ne xem e, lê eger rijî û xav û kêmxwê be, ne kêf be, weleh nayê xwarin. Tu bidî pisîka jî naxwin.

# Şerê taybetî û şerê manewiyetê

Şerê taybetî her çawa li temamê welatên bindest bi gelek rê û awayên ji hev cuda, bi mêtingeran re hatibe meşandin jî, mirov dikare bibêje bi temamî di dûmahîkê de, armanc nayê guhertin. Û mirov dikare bibêje di gelek welatan de bi rengekî tê meşandin. Îro li welatê me jî, mêtingerên Tirk şerê taybetî bi hevkariya şêwirdarê xwe; DYA û Ewrûpayê, li pêşberî serhildan û raperîna gelê me tê meşandin.

Şerê taybetî, şerekî bi gemar e û bi hovîtî tê meşandin. Îro baş eşkere bûye ku di vî warî de tu kes nikare avê li destê KT (TC) bike. Ew rastî hê ji kesrê Osmanî tê zanîn, ji bo ku tac û text bixine destê xwe, çend Sultanan bav, bira, pismam û kesên malbata xwe kuştine, an jî dane xeniqandin. KT'ê ew hunera Osmanî jê girtiye û wek mînaka, "şagirt ji hostê derbas dibe" bi hovîtiyeke hîn mezintir li ser gelê xwe, li ser gelên bindest daye meşandin. Di roja me de jî, hîn dijwartir dimeşîne. Ji aliyekî ve şerê çekdarî êrîşên xwe dimeşîne. Di şerê taybetî de giraniyê hîn zêdetir dide şerê manewiyatê (şerê psîkolojîk).

Şerê manewiyatê jî weke şerê taybetî bi destên mêtingeran hatiye meşandin. Armanca wan bi pirranî ji bo ku gelê xwe, gelê bindest û gelên cîhanê bixapînin. Hîn zehftir bi aliyên xweyî xurt dixwazin aliyên xwe yên qels veşêrin û xwe xurt bidin nîşan. Hacetên ku di vê riyê de didin şixulandin, çi tiştê ku destê wan digihîjê ew e... Di serê van hacet û tiştan de "zanîngeh", "profesor", "rewşenbîr", "partiyên siyasî", 'rojname", "TV", "radyo" û hwd henin. Bi kurtasî çi tiştên bi çav tên dîtin, tên xwendin û bi guhan tên bihîstin û tevî hêzên paşverû, mirov dikare bihejmêre. Gava ku van taktîkan dide meşandin ji bo ku bigihîje armanca xwe der mafê tevgera şoreşgerî de, der mafê serok û endamên partiyê de derew û bêbextiyan dike, serketina tevgera şoreşgerî vedişêre û qels dide xuyakirin. Bi vî awayî dixwaze baweriya gel bişkîne.




Em dikarin armanca bi rengî ya şer, bi dirêjayî bînin ziman, lê belê armanca vê nivîsara me ne ev e, di van rojên dawî de KT der mafê PKK û Serokê PKK û şerê ku li Kurdistanê tê meşandin de gelek tiştên nerast û çewt belav dike, em dixwazin di vê nivîsara xwe de hîn pirrtir li ser van bisekinin.

Baş tê zanîn ku di dîroka gelê me de bêhejmar serhildan û raperîn pêk hatine, lê belê ku rêberiya wan raperîn û serhildanan teva ne rast bûn û serokên wan an axa, an şêx, an jî seyît û mîr bûn (mejiyê wan jî parastina sînorê mafê malbat û eşîrekê zêdetir tiştekî nikaribû bifikire û nikaribû tifaqa gel bi tevayî damezirînin) û xwestin di qirnê XX'an de bi rêxistinên kevin bimeşin, di demeke kin de jî ew hatin kuştin û hinek ji wan hatine xapandin û kirrin, tevgerên wan têk çûn. Kurdistan jî kete rewşeke tarî. Ronahî bi ser gelê me de bi PKK û Serokatiya nûjen hat û gelê me bi xwîn, bi xwêdanê li pey serokatiya xwe ya nûjen li ber xwe da û ala têkoşîna xwe anî roja me, roja me berbanga serxwebûnê ye. Serxwebûn bi tifaqa gel ava bûye, tifaqa gel, di bin ronahiya serokatiya neteweyî de çêbûye.

Berxwedana gelê Kurd, di bin serokatiya nûjen de geş bû û hate roja me, gîha merhaleya ku gel bibêje, "PKK gel e, ez PKK me". Ev dirûşme tenê baş diyar dike ku tu hêz nikare gel û serokatiya nûjen ji hev veqetîne. KT jî vê rastiyê baş dizane. Bi artêşa xwe, bi alîkariya cerdevanan, bi alîkariya nokerên cih û bi alîkariya DYA û Ewrûpayê dîsa nagihîje armanca xwe. Sedema têkçûna KT'ê zanyarî û pisporiya serokatiya nûjen e. Ji ber vê yekê, îro KT hacetên şerê taybetî û şerê manewiyatê bi giranî li dijî serokatiya gel dide meşandin. Armanc ew e ku bîr û baweriya gel ji serokatiyê bişkîne. Tê zanîn ku di dîroka gelê me de sebebê têkçûna raperînan û serhildanan bêserokatî bû.

Ji ber vê yekê di van rojên dawî de, roj nîn e ku der mafê PKK, Serokatiya PKK û der mafê endam û şervanên PKK'ê de derew û bêbextiyan çap nekin. Çi dibêjin? Dibêjin: "Di nav PKK'ê de dubendî peyda dibin", "Pirsgirêkên wan zêdetir mezin dibin", "Di navbera Apo û endamên navendê de dûrketin peyda dibe", "Apo, hinek endamên navendê ji çavê xwe derxistin", "Apo hate binçavkirin", "Apo birîndar bû", "Apo hate kuştin", "Li felan deverê ewqas gerîla hatin kuştin", "Me êrîşek bir ser bargehên gerîlayan, me ew tar û mar kirin", "Di 1994'an de wê ev mesele dê biqede" û hwd..

Sedema belavkirina van nûçeyan, xerabkirina manewiyata gel û bi gumanhiştin e. Ji ber ku mejiyên mirovan şêlû bike, wesweseyê bixe dilê gel, bi van nûçeyên nerast di çavên gel de xwe xurt bide nîşan û geşbûyîna şer veşêre. Lê belê KT baş hatiye naskirin. Îro daxwaziyên wek mesela "Derewîno" li KT'ê hatiye. Ji sala 1984'an heta vê gavê bi hezaran carî "cudabûyîn" xistiye nava PKK'ê, gerîla "xelas" kiriye, Apo "girtî ye", "birîndar" kiriye, "kuştiye". Lê belê tev derew derketine. Êdî gelê me bi van nûçeyan, baweriya xwe nayine û manewiyata xwe xerab nake: Xwedîderketina li gerîla û PKK'ê meşa bi dû ronahiya Serokatiya Neteweyî vê rastiyê zêde zêde eşkere dike. Sedema belavkirina van nûçeyan bi destê KT'ê wek meseleya ku "mirîşk di xewna xwe de garîsê sor û spî bibîne". Lê belê xewn û rastî ji hev gelek dûr in.

**Mahmut Dunlayici**

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**



**Çeperast:** 1–Lîderekî Sovyeta Sosyalîst ê ku piştî Lenîn hate ser kar û êdî zehf bi radîkaliya xwe nav da, wekî din di têkbirina faşîzma Hîtler de rolekî seretayî leyist. Wêneyê wî tê dîtin. 2–Pêkenîka rexnegir/ Rovî, rûvî 3–Di dema berê de kişandina lêkera "Gotin"ê/ Awayekî bangkirinê 4–Ixtiyar, pîr/ Welatekî Ewrûpayî ku hê jî bakurê wê di bin dagirkeriya Îngilîstanê de ye 5–Dijwateyê katot/ Kesê nexweşîna wî ya anemiyê heye 6–Jîn 7–Zanîna xurt 8–Agir/ Kevneşopî, alelade 9–Kesê bi profesyonelî karê spora bazdanê dike 10–Dij/ Rûnê li ser mêst

**Serejêr:** 1–Peyva dubarekirinê û xurtkirinê/ Qezenc 2–Weşan, endam/ Hestiyên di dev de ku mirov pê xwarinê dicû 3–Zanyariya li ser sewalan 4–Di lîstika fûtbolê de dema top li destê lîstikvanekî dikeve tê gotin û lîstik tê rawestîn/ Tembelî, cangiranî 5–Ji mêjûya nediyar re tê gotin/ Li hinek deveran di şûna "dadê" de tê gotin 6–Netîceya musabeqeyekê/ Beşên ku pê sûreyên Quranê pêk tên 7–Li kesên xerab tê barandin 8–Pê hevîr tê çêkirin/ Nexweşîneke têger 9–Ji mêran re tê gotin/ Peyveke neyînî 10–Cejn/ Kurtenavê diravê Almanî 11–Tiştê dawî 12–Tiştê ne tûj (ji bo aletan birrînê)

**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Hatîp Dîcle 2–Evîn/ Anî 3–Sîrkut/ Rêdan 4–Asîman/ Zû 5–Beran/ Neman 6–Dem/ Em 7–Îrsî/ Es 8–Barîkat 9–Şelopelo 10–Ar/ Îd

**Serejêr:** 1–Hesk/ Dî/ Şa 2–Avî/ Berber 3–Tîr/ Emsal 4–Înkar/ Îro 5–USA/ ÎPÎ 6–Datîne/ Ked 7–În/ Meal 8–Cîran/ Stok 9–Êne 10–Erd 11–Aza 12–Henûn

## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat
İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095
Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul
Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |




# NEGRÎ

Negrî
Pêşeroj ya te ye
Rojên xweş bendewariya te dikin
Hêsrên te
Kenke şîrîn vedişêrin
Weke berfa buharê di bin xwe de vedişêre
Negrî
Xewnên spî
Wê para te bin
Hêsrên te, gewherên bêbuha ne
Erzan nede
Ji derdên giran re bihêle
Negrî
Zû ye ji te re girî
Hîn di qedera me de, derdên giran hene
Niha.. Negrî

***Jan Dost***

# Kuştina zarokan!

Sala pirtûk
Sala pîrek,
Sala zarok.
Li vir di sala pirtûk de
qelem hate kuştin
Li vir di sala pîrek de
zarok hatin kuştin
Li vir di sala zarokan de
pîrek hatin kuştin
Ey komeleyên hemû neteweyên yekgirtî,
Li vir îsal weke par e
par pêrar e
Li vir sal tenê yek nav heye
Ew jî sala zîndan û sêdar e.

***Şêrko Bêkes***

# Dora kê? Dor li kê?

"Ooo alo vingo
Pî qulingo
Mastê miyan
Li ser sêniyan
Cila kerê
Teq liviya"

Soro soro, kesk û soro
Mala moro, qor bi qoro
Simêl reş zembîl dest
Wek pola xortê malan

Çiqas xweş in, hûr dimeşin
Nekin gazin ez belengaz im

Wir de, wê de here were
Lawê axê tu vegere

Nenûk û neynik
Tenî û tepik
Lawkê karkir
Wekî şekir

Yek do sê
Çar pênc şeş
ore gerî
Çav vekirî

Hitil mitil
Nava me de
Kî ye bi dil

Lovî gîzer tivir
Sîr mastewe burxur
Pale hatin
Hûn belav kin
Nanê sêlê
Para şevê

Gêrî gêrî Gêrîvanê
Satil danî
Gul hilanî
Kî li vî alî
Kî li wî alî

"Ez Kurd im
Ser bilind im
Naxwazim bindestî
Dixwazim azadî"

# Têkoşîna şagirtê heft salî

Şagirtê heft salî li gundekî Mûşê diçû dibistanê. Bavê wî gerîla bû.

Rojekê mamosteyê wî yê Kurd bi Tirkanetî (!) û bi mafî (!) pirsî: "Ji do ve heta îro, we çi bihîst bibêjin."

Hevalê biçûk dest pê kir û got: "Hêzên dewletê û cerdevan pirr tirsonek in.." Mamosteyê Jêhat qîriya: "Hişt!" Mamosteyê bêfêm herdu milê xwe vekir, tevizî dan xwe. Dû re rûnişt û ponijî. Demokratî û ronakbîrîtiya wî ya demekê hate bîra wî. Ji şagirtan re got: "Ezê pirr tişt ravî we bidim. Hûnê zana bin. Dû re pere û polê we pirr bin. Wê her însan ji we hez bike."

Şagirtê xwendekar ê biçûk rabû û got: "Gundiyê me dibêjin, "Mamosteyê we Kurd e, lê bi pênc qirûşan nake."

Mamoste keniya û got: "Ew nizanin bi Tirkî, nizanin!"

Hevalê biçûk: "Wîîî.. Bi Xwedê na, yê Kurdî rind nizane ew cehş in. Bavê min dikare ravî te bike."

Mamoste dev vegerand û pirsî: "Hûn mezin bûn, hûnê bibin çi?"

Hevalê biçûk: "Gerîla olacağım, öğretmenim." (Ezê bibim gerîla mamosteyê min)

Mamosteyê Jêhat, çawa dest rakir, hevalê biçûk li dijî mamosteyê xwe avêt binê kursî û destê xwe rakir wek nîşanê digire û got: "Teq, teq, teq, xiiir, xiiir min tu kuştî."

***Jêhat Gimgim***

## *Jiyana Kurdên metropolan û rewşa têkoşîna jinan*

# 'Em jî êdî dizanin li mafên xwe bigerin'

**Hevpeyvîna li ser jiyana Kurdên ku li metropolên Tirkiyeyê dijîn em di vê hejmarê de jî didomînin.**

*Li navenda navçeya Baxcilarê, buroya ku em lê bûne mêvan, li ser rewşa Kurdan me xwest ku dîtinên çend jinan bistînin, ka jinên li vir di çi halî de ne?*

*Jineke ji endamên komîsyonê xwest wiha pirsa me ya yekemîn bibersivîne:* "Halê jinên Kurd eynî hal e, her çiqas em bibêjin "jinên Kurd êdî azad dibin" jî, lê bi ya min ne rast e. Ji ber ku jinên me yên ku ji Kurdistanê bi darê zorê koçber bûne, biborin, dijminan tecawuzê wan kiriye, çi tiştê pîs heye bi wan kiriye û gava têne vir dîsa koletiya xwe didomînin.

Li Kurdistanê dev ji mafên jinan berde! Mafên jiyana mirovan tune ye. Ez niha bi mêvanî li vir im û ez dibînim, ka gelo jinên me li vir çi dikin. Çawa ez dibînim ji bo xebata jinan mafê her tiştî heye di destê wan de. Lê mixabin tiştekî nakin."

*Hevala Muhteber li gor gotinên xwe îdia dikir ku,* "Hê jî jinên Kurd ne li bajaran, ne jî li gundan azad nebûne."

*Hevaleke din jî ev pirs wiha bersivand:* "Keko em mihacir in. Niha li welatekî din dijîn, wek ku hevala Muhteber jî got li welatê me mafê jiyanê tune ye. Warekî ku mafê jiyanê li wir tune be û bi hezar salan jî jin li bin destên mêran bin, wê çawa li mafên xwe bigerin?"

**■ Xaleta Încî: "Lawo wileh berî çend salan lêzimekî min hebû. Vêca bi malbatî hatibû Stenbolê, xaniyek ji wan re pêwist bû. Me jî, ji wan re peyde kir. Em çûn ku xênî kirê bikin, xwediyê xênî li me nêrî û got: "Zû ji mala min derên". Lewre serê min vekirî bû, min hêratî jî li xwe nekiribû û çima ku em Kurd bûn berî me da."**

*Jineke din bi navê xwe Perîzade jî wiha digot:* "Ev çar meh in ku ez li vê derê me. Çawa ku me fersenda ber piyê xwe dît, em li mafê xwe geriyan û ez di wê baweriyê de me ku kîjan jin van salên dawî li Kurdistanê mabe û niha li metropolan dijî, li mafê xwe digere."

*Me pirsî ka nêrînên kesên din der heqê vê pirsê de çi ne?*

*Hinekî sekinîn û xwişka Gulîstan got:* "Ev 25 sal e ku ez li vê derê me, sedema hatina me ya metropolê ji ber rewşa aborî bû. Gava em nû hatibûn, me diçû ji xwe re li xaniyan digeriyan, ji me dipirsîn ka em ji kîjan bajarî ne. Ku me navê bajarekî Kurdistanê digot hingê ji me re digotin "Kuyruklu Kürt" (Kurdê bi boçik). Berê ji ber ku me bi Tirkî nizanibû, bi vê gotinê em tê nedigihîştin lê niha em zanin ku tê çi wateyê."

*Metropolan çi bandor li ser we hiştiye, ango li ser zimanê we, çanda we û hwd?*

– Ger ez bi tenê bim ji aliyê zimanê Kurdî ve qet bandora wan li ser me çênebûye, lewre hemû zarokên min jî zimanê xwe baş dizanin, hew çendî bi Tirkî jî xwendine, zimanê xwe ji bîr nekirine û her sê zarokên min jî bi zimanê xwe baş dizanin.

*Hûn çi dibêjin?*

– Dîdar: Bandora metropolan li ser me heye. Li metropolan her çiqas me dev ji gelek orf û adetên xwe berdabe jî, çiqas ji bîr jî kiribe, niha ji bo car din wan orf û adetên xwe bi destê xwe bixin em têdikoşin.

*Têkoşîna ku hûn dikin li her derê ye, an tenê li vê saziyê ye?*

– Çiqas ji destê min tê ez dixwazim vê tekoşîna xwe li her warî bikim. Cara yekemîn bû dema li malê min qala mafên jinan dikir, zilamê min tiştekî ecêb aciz dibû, lê niha gelek hêsan em li ser mijara mafên jinan dipeyivin û ezê zilamê xwe jî bi saya vê têkoşîna xwe bînim rayê."

*Hevala Dîdar hûn ji kîjan bajarî ne?*

– Ez ji bajarê Meletê me, 22 salî me û ev 2 sal e li Stenbolê dijîm.

*Gelo bi ya we di nava jinên Tirk û Kurdan de tiştek heye, ango cudahî û wek wê?*

– Xaleta Încî: Lawo wileh berî çend salan lêzimekî min hebû. Vêca bi malbatî hatibû Stenbolê, xaniyek ji wan re pêwist bû. Me jî, ji wan re peyde kir. Em çûn ku xênî kirê bikin. Xwediyê xênî li me nêrî û got: "Zû ji mala min derên". Lewre serê min vekirî bû, min hêratî jî li xwe nekiribû û çima ku em Kurd bûn, berî me da.

*We çi kir?*

– Me jî sedema vê yekê ji wan pirsî, jinikê got: "We (Kurdan) du lawên min ên leşker kuştine, hûn bi kîjan rûyî ve tên xaniyên min bi kirê dixwazin? Zû herin nexwe ezê gazî polîsan bikim."

*Zarokên te hene xaletê?*

– Belê lawo 2 zarokên min hene.

*Bi Kurdî dizanin?*

– Belê, belê. Ev deh sal bûn ku nizanibûn, lê niha em li mal bi Kurdî bi hev re dipeyivin.

*Zarok çawa Kurmancî fêr bûn?*

– Wele min û bavê wana li malê bi Kurmancî xeber dida, wan jî meraq dikir û dixwestin ku em zimên fêrî wan jî bikin. Tiştê me dizanibûbi devoka xwe hînî wan kir. Lê tenê bi devoka xwe.

*Xwişka Bêrîvan hûn bi Kurdî dizanin?*

– Belê, ez dizanim, ji bajarê Bilîsê me û ta 12 saliya xwe jî min bi Tirkî nizanibû.

*Heval navê we çi ye?*

– Nurhayat e.

*Hûn ji kengê ve li vir in?*

– Ev bû çar sal.

*Hûn zewicî ne?*

– Belê, ev pênç sal e ku zewicî me.

*Armanca we ji vê saziyê çi ye?*

– Ji xwe hevalan bersiva vê pirsê dan, ezê jî wek wan bibêjim, ji ber ku rastî ew e. Dewlet bi her awayî li Kurdistanê bi ser gelê me ve diçe, em jinên metropolê jî me biryar da ku emê li hember van kirinên qirêj yên ku dewlet bi kar tîne bêdeng nemînin û bi vê yekê re jî mafên jinan biparêzin.

*Hûn jin ên li vir, ji berê ve hev nas dikin?*

– Na.. na, ev cara yekemîn e ku ez çend hevalan dibînim. Berê qet min ew nedinasîn.

*Hûn di vê hewldana xwe de çiqas bi ser ketine?*

– Em ên li vir, ji wî aliyî ve hê nû dest pê dikin. Hejmara me jî niha hindik e. Lê di pêş de emê bi ser bikevin.

*Di nava vê saziya we de jinên Tirk jî hene?*

– Tirk tun in. Lê em tev asîmile bûne. Armanceke vê civaka me jî ew e, ku em ên li vê derê ne, xwe ji asîmilebûnê zû xelas bikin. Bi jinên Tirk re jî niha em ketine têkiliyê, bi texmîna min di nêzîk de wê ew jî beşdarî me bibin.

*Keçikeke 15 salî jî li wir bû, me xwest dîtinên wê jî bigirin.*

*Heval navê te çi ye?*

– Navê min Gurbet.

*Karê te li vir çi ye?*

– Hesreta welat dikişînim. Wextê ku ez tême vir, ji ber ku tev de Kurd in hindik be jî bêhna min dertê. Bi rastî ez bêriya welêt dikim, ezê herim welêt.

*Xwişkê hûn ji vê saziyê çi hildigirin?*

– Çîçek: Ev cara yekemîn e ku tême vir, hevalekî ji me re çend rûpel pirtûk xwendin, me tevan lê guhdarî kir, ger wiha be, zehf rind e û mirov gelek jî bi pêş ve dibe. Mesela heta niha min tu tişt der heqê mafên jinan de nizanibû, va ye gelek mafên jinan hene!.



*Jinên Kurd ên li metropolan dijîn jî, êdî bi xwe hesiyane û li mafên xwedî derdikevin.*

***Roportaj:***
***Salih Günbat***


welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tîgrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık